bivekirin, divê Merov azadîya serûştîyê, ya ku ew bes û bi tenha ve sînorên xwe di hêzên yek Neferî de dide bidîtin, bi carekê ve ji azadîya Neşîvanîya Dewletê bide bicudakirin, ya ku ew di rêya vîna giştî de tête bisînorkirin. Herwehajî bi vî rengê hanêjî ve divê Merov di navbera malkirinê de, ya ku ew bes û bi tenha ve bi kêra hêzê ve yanjî bi mafeyê destdanîna pêşî ve tête bidîtin, û maldarîyê de, ya ku ew bes û bi tenha ve rast û durust li ser bingehê mafe de dikare bête bingehkirin, bide bicudakirin.

Li paş vegotîyan de Merov dikare hêjîbêtir ji bona karên zîneta civakî azadîya sincîtî jî bi ser ve bide bivekirin, ya ku ew bi tenha xwe ve Merovan di pêşîya pêşî de bi rastî ve bi Mîrza ve li xwe bi xwe ve dide bikirin; jiber ku livandina dilbijandinê bi xwe ve bi bendîtîyê ve tête biderkevtin û bisertewandin, beramber bi qanûnê ve, ya ku Merov ji ber xwe ve ew li ser xwe de dayite bidanîn, bi azadîyê ve tête biderkevtin. Belê li vir jî de min bi pîrbûn ve date biaxivtin û têgihîştina felsefîyî gotina azadîyê ne ji erkên karê min tête bidîtin.

## Derîyê Nehem

Her Libatekî civatê ji bona civatê di wê bêhnê de tête bikevtin, gava ku ew tête biavakirin û ev jî bi rastî jî ve wer tête bikirin, gava ku ew bi tevaya xweyîtiya xwe ve û bi hemû hêzên xwe ve û pêrejî bi hemû maldarîyên xwe ji bona nava civatê tête bikevtin. Bi vêjî ve ku malitî ji bona nava destên din jî tête bikevtin, ew ne serûştîya xwe ne jî maldarîya Serwer -Souverän- dide biveguhertin, belê jiber ku hêzên civatê bi gelekî ve mezintir ji hêza her Neferekî bêtir têtin biderkevtin, weha malitîya civatê bi rastîjî ve bi hîmtir û girawtir ve tête biderkevtin, bêyî ku ew bi kêmanî ve beramberî Bêganan jî bi mafetir bête biderkevtin; belê jiber ku dewlet beramberî bi Libatên xwe ve di rêya Peymana Civakî de, ya ku ew di dewletê de nala bingehê hemû mafeyan dide bikarkirin, bi Mîrzayê ser hemû maldarîyê ve tête biderkevtin; lêbelê dewlet beramberî bi dewletên din ve bes û bi tenha ve dikare di rêya mafeyê pêşîyê de maldarîyê ji xwe re bide bisitandin, ew mafeyê ku ji bona wêna ji bal Neferan de hafîye bipêdan.

Tevî ku mafeyê malitîya sitendina pêşî -das Recht des ersten Besitzergreifers- rasttir nala mafeyê Xurttirvan tête biderkevtin, weha dê ew belê di pêşî de piştî hîmkirina mafeyê maldarîyê bi mafeyekî rast û durust ve bête biderkevtin. Ji serûştîyê her Merovek mafeyekî wî ji bona hemûyî tête bidîtin, yên ku ew bi neçarî ve jêre têtin bipêwistîkirin; lêbelê bi xwe ve peyman, ya ku ew wî bi Maldarvanê malekî ji mal ve dide bikirin, wî ji hemûyên din dide bidûrkirin. Piştî nîşakirina pişka wîna divê ew xwe li ser wê de bide bisînkirin û nema tu mafe jêre bêtir li ser maldarîya civatê de tête bidîtin. Jibervêjî mafeyê sitendina malitîyî pêşîyî wehayî lawaz di zînetê serûştîyê de weha li nik her Neşîvanekî Dewletê de bi hêjabûn ve tête biderkevtin. Merov li nik vî mafeyê hanê de kêmtir li maldarîya yekekî din de dide biguhpêdan, ji yekeke ku ew bi ya Merov ve bi xwe ve nayête biderkevtin.

Da ku mafeyê malitîya sitendina pêşî li ser perçakî erd de bête bingehkirin, bi giştî ve mercên tînan divên bêtin bidîtin: yekem, ku perçakî erd hêjî ji bal tu kesî ve nayête bineşînkirin, duwem, ku

Merov jê bes û bi tenha ve weha bi pirbûn ve bide bibirin, mîna ku Merov pê dikare bête bijiyandin, sêyem û dawî, ku Merov ne di rêya xuyanîyên vala de malîtiya wî ji xwe re bide bisitandin, lêbelê wî ji xwe re di rêya kar û çandinyê de bide bisitandin; jiber ku ev karên hanê nîşana bi tenha xwe ve ji bona maldarîkirinê tête bidîtin, ya ku ew di nebûna belgeyekî qanûnî de divê ji bal yê din de lê bête birûmetkirin.

Gelo Merov ji bona mafeyê pêşîyî sitendina malîtiyê bi rastî ve pê dûrtirîn firehbûn nade bidan, gava ku Merov wî ligel pêwistîyê û kar de dide biyekkirin? Gelo Merov dikare vî mafeyê hanê nede bisînorkirin? Gelo divê bêtin bitêrkirin, ku Merov lingên xwe li ser perçeyekî erdê civatîyî hevbeşî de -gemeinschaftliches Stück Land-bide bidanîn, da ku Merov xwe bi xwedanê wî ve bide biderxistin? Gelo xurtbûn dikare bide bitêrkirin, ya ku ew Merovên din di dirêjbûna awirekî de ji nava erd dide bipengizandin, da ku ew ji wan mafeyê vegerandinê bide bisitandin? Ma çawan Merovek yanjî Miletik dikare heger ne di rêya sitendineke malîtiyî ne mafeyî de heremeke pir fireh ji xwe re bide bivegirtin û ew ji wê tevaya Reha Merovanîyê bide bibêpişkîkirin û ew bi vî rengê hanê ve Merovên din ji cih, xwarin û vexwarinê dide bitalankirin, yê ku seruşî ji bona wan tevan bi civatî ve dide bidan? Gava ku Nunez Balbao -Nunêz Balbaw-bi navê Taca Kastilien -Keştîle- ve derya Jêrî û tevaya Amerika Latînî ji kenar û pê de date bimalkirin, gelo vêna bi xwe ve dida bitêrkirin, da ku ji hemû Neşînvanan mafeyê maldarîya wanê erd bête bisitandin û hemû Mîrên vê dunyayê ji wî erdê bide bibêparkirin? Li nik diyarîyên wisa de van şeweyên sofîtîyên hîç û pûç xwe pir caran didatin biderxistin û Padîşahê Katolikî jî divabû bes û bi tenha ve ji bona yekcarê tevaya dunyayê ji xwe re bi malîti ve bide biwegirtin, lêbelê ku ew li paş de ji nava Imperatorîya xwe hemûyî bide biderkirin, yê ku ew ji bal Mîrên din de bi malîti ve -in Besitz-hatibûn biwegirtin.

Bi hêsanî ve tête biliberkevtin, bê çawan erdên sînorkirî ligel hevdu de yê Neferên bi serhevdu ve ji bona herema dewletê têtin bikirin û bê çawanjî mafeyê Serwer -Souverän- yê ku ew xwe li ser herema vegirtî de ji para Jêrdaran de dide bifirehkirin, bi mafeyekî ser bi ser ve û bi mafeyekî xweyî ve tête bikirin, yê ku ew Vegirtvanan bi pêgirêdaneke mezintir ve dide bikirin û ew hêzên wan bi xwe ve ji bona girawkirina



xwe dide bikirin. Di vir de başîyek tête biderkevin, ya ku ji bona wêna Padîşahan di demên kevnar de tu liberkevtin jêre nedidan bikirin yanjî jêre nedidan bixuyanîkirin. Wan li xwe de bes û bi tenha ve navên Padîşahên Farisan, Skytan -Şîtan- û Makdonîyan didan bikirin û jîbervêjî wan xwe bêtir bi Axayên Xelkên ve ji Mîrzayên Welêt ve didatin bidîtin. Di vê roja hanê de ew xwe gelekî bi jîrbûn ve bi Padîşahên Firensa, Sîpanya, Ingilistan ûhd. didin binavkirin û ew bi vî rengê hanê ve welêt jî ji xwe re didin bisitandin û ew bi carekê jî ve pê didin bibawerkin, ku ew dê Xelkê jî di jêr jêrdarîya xwe de bidin bihiştin.

Taybetîya li nik vê devjêberdana hanê de di vir de tête biderkevtin, ku civat di rêya wergirtina maldarîya Neferan de ne maldarîya wan dide bitalankirin, lêbelê di vir de bi xwe ve ji wan re maldarîya mafeyî ji bona van Zemîndarîyan bi rast û durustî ve dide bigirawkirin û ew sitendin maldarîyê ji bona mafeyekî rast û durust û hilanîn û danîna wê zemînê ji bona mafeyê maldarîyê dide biveguhertin. Jiber ku li Zemîndaran de niha nala Parêzvanên zemîndarîyên dewletê tête bitemaşekirin û mafeyên wan ji bal tevaya Endamên dewletê rêz li wan de têtin bigirtin û ew bi tevaya hêzên xwe ve wan mafeyên hanê beramberî Bêganan didin biparastin. Weha wan di rêya jêdakevtinê ji bona berjewendîya giştî ji xwe re jê qazanceke gewretir dane biwergirtin. Wan hemû danên xwe bi carekê ve careke din ji xwe re dane biwergirtin. Ev dijûna hanê xwe di rêya cudakirina di navbera mafeyê Serwer -Souverän- de û mafeyê Maldaran de li ser yek perçe erd bi xwe de bi hêsanî ve dide biliberxistin, mîna ku em dê di pişt re bidin bidîtin.

Dibejî bête bidîtin, ku Merov dest bi yekkirina xwe ve bidin bikirin, berî ku ew tiştêkî ji xwe re bidin bimaldarîkirin û gava ku ew di pişt re ji xwe re heremeke têrkirî ji bona tevan didin bivegirtin, wê çaxê jêre hilanîn û danîneke tevayî tête bidîtin, yanjî ew wê heremê di nava xwe de didin biparvekirin, çî di rêya parvekirina mîna hev de, yanjî ew wê li gora pişkên danînê de ji bal Serwer -Souverän- ve di nava xwe de didin biparvekirin. Li gora kîjan rengî jî de bidestkevtina zevî jî bête bidîtin, hertim mafeyê Neferî li ser zevîya wîyî taybetî jî de xwe li jêr mafeyê civatêyî hemûyî de dide bidîtin, bêyî vêna dê yekîtiya civakî xurtbûn û bicîanîna Serwerîya -Souveränität- xweyî rastî bide

biwindakirin.

Ez vî derî û vê nivîsta hanê bi rûnkirinekê ve didim bidawîkirin, ya ku ew ji bona her rêstikeke civakî nala bingehê divê bide bikarkirin: Peymana Civakî bigir wekhevbûna serûştî nade bihilanîn, lêbelê bi servajîvêjî ve ew li şûna newekhevbûna laşî jî de, ya ku serûştî wê dikare di nava Merovan de bide bipeydakirin, wekhevbûneke sincî û yasayî bide bidanîn, weha ku Merov, hegerjî ku ew bi hêza xweyî gewdeyî û canî jî ve dikarin newekhev bêtin biderkevtin, di rêya peymangirêdanê û mafeyan de hemû nala hev têtin biderkevtin<sup>1</sup>.

---

<sup>1</sup>Ji bona dewletên bed re ev wekhevbûna hanê bes û bi tenha ve xuyanîyekê û xapandinekê dide bipêkananîn; ew bes û bi tenha ve têtê bikaranîn, da ku ew Perîşanan di nava perîşaniya wan de û Dewlemendan di nava dewlemendîya wanî nemafeyî de bide bihiştin. Di rastîyê de qanûn hergav bes ji bona wanên zengîn têtin bidîtin, yê ku ew hinekî bi maldarin û ew ji bona Bêmalدارan bi ziyar ve têtin bidîtin. Ji vê têtê biderkevtin, ku ji bona Merovan zînetê civakî weha bes û bi tenha ve bi kar ve têtê biderkevtin, gava ku ji bona her yekekî hinek jêre têtê bidîtin û ji bona tu kesî weha bi pîrî ve jêre nayête bidîtin.

## Nivîsta Duwem

### Derîyê Yekem

Encambûna pêşî û giringtir ji bingeheên tanî nihayî hatine bidanîn, ku vîna giştî bi tenha xwe ve hêzên dewletê li gora ermanaca pêkhatina wêna de dikarin bidin birêvebirin, ya ku ew di bextîyarîya tevayî de tête bidîtin, hegerjî dijûna berjewendîyên taybetî pêkanîna civakan dane bineçarîkirin, weha wêna bi vêjî ve lihevkirina berjewendîyên mînahev dikarîbû bide bidurustkirin. Hevbeşîya di navbera van berjewendîyên cudan de Pêwendîya Civakî dide bipeydakirin; hegerjî deqek ji deqan nehata bidîtin, ya ku têde hemû berjewendî lihevdû de didin bikirin, weha hîç civakek nikarîbû bihata bimayînîkirin. Bes û bi tenha ve li gora van berjewendîyên hevbeşî de divê civak bête biserdarîkirin.

Weha ez dikarim bidim biencamkirin, ku Serwerî -Souveränität, ya ku ew bes û bi tenha ve pêrabûna vîna giştî dide biderxistin, tucarî nikare bête bijêdakevtin û Serwer -Souverän- yê ku ew Jîndarekî Tevayî ye, bes û bi tenha ve dikare xwe di rêya xwe de bide bivederxistin. Desthilatî belê dikare bête bidan, belam vîn nikare bête bidan.

Bi rastî jî ve nebinikarîbûn dikare bête bidîtin, ku vîna Neferekî di deqê ji deqan de ligel vîna giştî de bête bilihevkirin, belam bi kêmanî ve nikare bête bidîtin, ku ev lihevkirina hanê bi dirêjî û hişîtî ve dikare bête biderkevtin; jiber li gora serûştîya Neferan de vîna wan ji bona bêtirbûna mafeyan ji xwe re dide bixebatkirin, bi servajî vîna ve vîna giştî ji bona wekhebûnê dide bixebatkirin. Hêjîbêtir nikare bête bidîtin, ku Merov ji xwe re Neşînvaneke ji bona vê lihevkirina hanê bide bidîtin, tevlihevî heger lihevhatineke wetov jî hate bipeydakirin,

dê ev lihevhatina hanê ne ji kêra hunerê bête bidîtin, belam dê ew ji kêra lihevraştahatîne bête bidîtin. Serwer -Souverän- belê dikare bide bigotin: "Ez niha dixwazim, çi ev Merov yanjî yê din dide bixwestin, yanjî bi kêmanî jî ve ez wê xwestîyê didim bigirawkirin". Belam ew nikare bide bigotin: "ez dê sibehê jî bidim bixwestin, çi ev Merovê hanê dide bixwestin"; jiber bi hîç û pûçî ve tête biderkevtin, ku vîn xwe bi zincîrên ayindê ve bide birapêçadin û bi tu desthilatîya ve vînek ji vînan nayête bigirêdan, ku ew tişteki bide bidilkirin, ya ku ew ji bona bextiyarîya daxwaza Jîndarekî tête bidijkirin. Jîbervêjî ve heger Miletêki soz date bikirin, ku ew dê bi bê bend û merc ve serê xwe bide bitewandin, weha ew hebûna xwe di rêya sozekî wetov de dide binabûdkirin û ew pê rûçikê xwe nala Miletêki dide biwindakirin û di wêgava Serdarek bête bipeydakirin, wêçaxê nema Serwerek dikare bêtir bbiête dîtin û ji vê awira hanê de Laşê Dewletê - Staatskörper- tête bitarûmarkirin.

Evaya divê nede bigotin, ku fermanên Serokan ji bona tevaya remana vîna giştî nikare bête biderkevtin, tanî ku Serwer, yê ku azadî jêre tête bidîtin, ku ew xwe dijî van fermanan bide biberamberkirin, ji mafeyê vê beramberkîrinê tu pêrabûnê nade bikirin. Ji rûdaneke wisa divê Merov ji bêdengîyek tevayî ve bi pêrûniştina Milet ve pê bête bitêgihiştin. Ji vîna re raxistineke dirêj tête bidivakirin.

## Derîyê Duwem

### Serwerî -Souveränität- nayête biparvekirin

Hoyê bi xwe jî ve, yê ku jê Serwerî nayête bijêdakevtin, wehajî ew ji bona nebiparvekirina wêna jî dide biaxivtin, jiber ku vîn divê bi tevayî ve bête biderkevtin<sup>1</sup>, yanjî ew ne bi tevayî ve tete biderkevtin, ew bi ya giştîya Milet ve tete biderkevtin, yanjî ew bes û bi tenha ve ya perçayekî jê tete biderkevtin. Di zîneta pêşî de liberkevtina vê vînê bi karekî Serwerî ve tete bidîtin û jê re hêza qanûnê tete biderkevtin, di zîneta duwem de ew bes û bi tenha ve vînek bi tenê ve yanjî bi karekî deshilatîya bilind ve tete biderkevtin; ew bi vî rengî ve dikare bi pirî ve nala fermanekê bête bidanîn.

Lêbelê Dewletvanên me Serwerî -Souveränität- nikarin di armanca wê de bidin biveparkirin, weha ew wê bi kêmanî ve li gora mebesta wê de didin biveparkirin; ew wê di hêz û vînê de, di desthilatîya qanûndanîne û deshilatîya bicîanîne de, di mafeyê wergirtina bacan û dazanîna cengê de, di serpereştiya hundurû û karmendîya ji bona kar û barên derve de didin biveparvekirin; carna ew van perçan hemûyan dihêlin tevlihev bêtin bikirin û carna jî ew van jihev didin biveparvekirin. Ew ji Serwer -Souverän- ve Jîndarekî nigaşî û bi hev re perçekî didin bikirin, tê bêjê, ku ew Merov ji gelek laşan didin bidurustkirin, ji wan yek bes û bi tenha ve xwedan çav, yê din bes û bi tenha ve xwedan mil û yê sêyem bes û bi tenha ve xwedan pî û jê pê ve tişteki din li nik wî de nayête bidîtin. Canbaz li Çapan de, weha Merov dide bivegotin, li ber çavên Temaşevanan de Mendalekî didin biperçeperçekirin û li paş ku ew hemû libatên wî li ber ba dikan, careke din ew Menal dihêlin bête bizindanîkirin û hemû libatên wî

---

<sup>1</sup>Tevaya vînê ne herdem yekbûna dangan dide bixwestin, belam divê jimartina hemû dangan bête bikirin, her renegekî din bi diyarî ve tevayê dide binayînkirin.

têtin bisaxkirin. Ev rengê hanê bigir mîna yariyên canbazîyên Dewletvanên me têtê biderkevtin, piştî ku ew laşên civakî - Gesellschaftskörper- di rêya canbazîyekê de didin bipereçeperçekirin, ya ku Merov vê canbazîya hanê di nava bazarên salanî de ji xwe re dide bidîtin, weha ew wan perçan bi hev ve didin bivekirin, lêbelê Merov nizane bê çawan ew wan perçan careke din bi serhev de didin bixistin.

Ev şaşbûna hanê ji vê têtê biderkevtin, jiber ku Merov di serê xwe de tu wênêyên rast û durust ji bona têgihîştina deshilatîya dewletê nedaye biavakirin û wî tiştên, yên ku ew bes û bi tenha ve ji vê deshilatîyê hanê dihatin biderkevtin, bi perçên wê ve didan bidanîn. Weha Merov ji bona nimûne dazanîna cengê û girêdanên aşîtyê bi karên Serwerîyê -Souveränität-ve didan bidîtin, yên ku ew bi tucarî ve wer nayên bidîtin, ji ber ku hîç yekek ji van karan bi qanûnekê ve nayête biderkevtin, lêbelê her yekek ji wan bes û bi tenha ve bi cîanîna qanûnê ve têtê biderkevtin, yê ku ew bi karekî nîşankirî ve ji bal qanûnê têtê biderkevtin, mîna ku dê Merov bi diyarî ve bide bidîtin, gava ku ew ligel gotina têgihîştina qanûnê de bête biliberkevtin.

Ligel ezmonkirineke wetov de ji bona parvekirinên din de dê Merov ji xwe re bide bidîtin, ku Merov hercar xwe dide bişaşkirin, gava ku Merov Serwerîyê -Souveränität- bi parvekirinê ve dixwaze ji xwe re bide bidîtin û mafeyên, yên ku Merov wan ji perçeyên vê serwerîya -Souveränität- hanê dide bidanîn, jê re bi carekê ve têtin bijêrdarîkirin û ew jê re hercar vîneke bilindtir didin bimerckirin, ya ku ew bes û bi tenha ve di rêya van mafeyên hanê de ji bona bicîanîna xwe ve têtê bigihaştin.

Merov bi xwe jî ve nikare bide bigotin, bê kanî çiqasî pir vê kêmanîya hanê di rastîyê de raxistina Dadyarên Dewletê dayite bipoşandin, gava ku wan li ser mafeyên dijhevkirîyî Padîşahan û Miletan de li gora danînen bingehên qanûnên ji bal wan ve xwestine bidin bidadwerîkirin. Heryek dikare di derîyê sêyem û çaremîn de di nivîsta pêşîyî Grotius -Grotyos- de ji xwe re bide bixwendin, bê kanî çawan ev Zanistvanê hanê û Wergervanê wîna xwe ji tirsan ve dane bixapandin û bişaşkirin, evjî li gora dîtina wan de bi pirî yanjî bi hindikbûn ve bidin biaxivtin û da ku ew berjewendîyan nedin birîndarkirin, yên ku divabûn ew wan ligel hevdu de bidin

### 39 Peymana Civakî

---

bilhevkerin, evjî bi erkê wan ve hatibû bidanîn. Grotius -Grotyos- ji bona Frensa hatibû bipenahindekirin û ew ji welatê xwe hatibû bitûrekirin. Grotyos ji bona Ludwig XIII-Ludvigê- 13 de nivîsta xwe date bidiyarîkirin û wî xwest, ku ew şelafiyê ji xwe re ligel wî de bide bikirin û jibervêjî wî çavtengî neda bikirin, ku ew Miletan ji tevaya mafeyên wan bide bitalankirin û bi jîrbûneke konetî ve wan mafeyan ji bona Padîşah bide bixelatkirin. Ev dê jî bi carekê ve li gora kêfa Barbeyracs -Barbeyraks- de bihata biderkevtin, yê ku wî wergerandina xwe ji bona Padîşahê Ingilîzî Georg I -Corcê Yekem date bidiyarîkirin. Mexabîn derkirina Padîşahê Jacob II. -Yaqubê Duwem, yê ku wî ew bi jêdakevtîne ve date binavkirin, wer ew date bineçarîkirin, ku ew pir bi tirs ve bête bihiştin. Wî li valî û li walî de çiv û kosetî didan bikirin, da ku ew Wilhelm -Wilhêlmê Padîşahê Elmanî, Cuma- nenala Talankeran bihêle bête biderkevtin. Heger ku van herdu Nivîskaran bîr û bawerîyên rastî ji xwe re bikar bidana bikirin, wisa dê hemû dijbûn bihatana bihilanîn û dê ew hertim ligel xwe de bi xweşî ve bihatana bimayîn, lêbelê wêçaxê dê wan xwe di cihekî dilşikestî de bidana bidîtin, ku wan rastî divabûn bidana bigotin û xwe bes û bi tenha ve li ber dilê Milet de bidana bixweşkirin. Belam rastî ji bona zengînbûnê nade biajotin û Milet jî ne Balozvanîyê, ne jî Kursîyên Mamostîyê û ne jî Perên dilovanîyê dide bixelatkirin.

## Derîyê Sêyem

### Gelo Vîna Giştî dikare bête bişaşkirin?

Ji yê çûyî de têtê biderkevtin, ku vîna giştî timî rast têtê bidîtin û hergav ew ji bona başîya tevayî têtê biarmancîkirin; lêbelê ji vîna nayête biencamkirin, ku biryarîyên Milet hertim bi rastî ve têtin biderkevtin. Merov hergav başîyê ji xwe re dide bixwestin, belam nehergav Merov dide bidîtin, bê ka ew başîya hanê li kûderê de têtê bikevtin. Milet bertûlkirina xwe nahêle bête bikirin, lêbelêjî pir caran ew xapandina xwe dihêle bête bikirin û vê çaxê bes û bi tenha ve ew xwestîya şer dide bidiyarkirin.

Cudabûneke mezin di navbera vîna tevan û vîna giştî de têtê bidîtin, Vîna giştî bes û bi tevha ve xwe ji bona kara giştî dide birakişandin û Vîna tevan xwe ji bona kara taybetîyî Neferan dide birakişandin û evaya bes û bi tenha ve tevayekê ji vînen remanên Neferan dide biderxistin. Heger Merov ji van vînen remanan pîrbûnê û kêmbûnê bidin biderxistin, yê ku ew xwe bi hevdu ve didin bihilanîn<sup>1</sup>, wer jê nala cudabûnekê vîna giştî têtê bimayîn.

Heger ku li nik wergirtina biryarekê de ji bal Miletêkî neagehdar de Neşînvana bê pêwendî ligel hevdu de bihatana bidîtin, weha dê ji jimareke pir ji cudabûnên biçûk vîna giştî bihata biderkevtin û dê biryar hertim bi başî ve bihata biderkevtin. Heger di vir de partî bêtin bipeydakirin, heger guruh xwe li dijî komelên mezin de bidin bidurustkirin, weha dê vîna her guruhekê ji van guruhan beramber bi

---

<sup>1</sup>Maquis d'Argenson -Marquis de Argenson di "Considérations sur le gouvernement de la France" de dide gotin, "ku her karek ji bîr û bawerîyên cudan têtê biderkevtin. Lihevkirina du karên taybetî li ser dijûna kara yekekî sêyem de têtin biderkevtin". Belê wîna hêjî dikarîbû pê bida bivekirin, ku lihevkirina tevaya karan bi dijî kara her yekekî jê têtê biderkevtin. Heger tu karên cudan nehatana bidîtin, weha dê Merov bi kara hevbeşîyî giştî ve pê nedaya bihestkirin, ya ku dê wê di pêşîya xwe de tu bergîrî nedaya bidîtin. Hemû dê ji ber xwe ve bi rê ve bihata biçûyîn û dê Ramyarî nema bihata dîtin, ku ew bi hunerekê ve bête biderkevtin.



## 41 Peymana Civakî

---

Endamên wan ve bi vîna giştî ve bête biderkevtin û ew dê baramberî dewletê bi vîna yeka yekan ve bête biderkevtin; wêçaxê Merov dikare bide bigotin, ku nema wisa pîrbûna xwedandengan nala jimara Merovan têtin biderkevtin, lêbelê ew bes û bi tenha ve weha bi pir ve têtin biderkevtin, mîna ku komel têtin bipeydakirin. Cudabûn dê di jimarên xwe de bi kêmtir ve bêtin biderkevtin û ew dê ji bona encamkirineke giştîyî kêmtir bide biderxistin. Heger di dawî de jî yekek ji van komelên mezin wisa hate bigewrekirin, ku ew di giranîya xwe de bi ser tevan ve hate bikevtin, weha encam nema bêtir bi jimara cudabûnên biçûk ve têtê biderkevtin, lêbelê ew bi cudabûneke yekane ve têtê biderkevtin; wêçaxê vîna giştî nema bêtir têtê bidîtin, ya ku jê biserkevtin hatîye biderkevtin, bes û bi tenha ve bi dîtina Neferî ve têtê biderkevtin.

Da ku liberkevtineke diyar ji bona vîna giştî bête biwergirtin, jibervêjî bi giringî ve têtê biderkevtin, ku di dewletê de bikarîbûn tu komelên taybetî neyêtin bipeydakirin û her Neşînvaneke Dewletê bes û bi tenha ve divê ji bona derxistina bîr û bawerîya xwe bête bidîtin<sup>1</sup>. Jibervêjî dam û destgehên avakirî ji bal Lykurg -Likurgê Mezin de li ser van bingehên hanê de wisa di rengê xwe de bi yekane ve dihate biderkevtin û ew weha berz dihate bidîtin. Hegerjî ku komelên wisa taybetî bêtin bipeydakirin, divê ku Merov jimara wan bide bipirkirin û newekhevûna wan nehêle bête bihiştin, mîna ku Solon, Numa û Servius Tullius -Serviyos Tulyos- ev dane bikirin. Ev rêzanên xweparastinê bes û bi tenha ve dikarin bidin bikêrkirin, gava ku vîna giştî her dem û çax bi diyare ve bête biderkevtin û Milet xwe nade bixapandin.

---

<sup>1</sup>Mikavili dide bigotin: "Bi rastî ve cudabûnên bi ziyar ve û hin ji wan jî bi kar ve ji bona Komarê têtin bidîtin. Her tiştê ku ew partîyan didin bixwîngermkirin, ew ji bona Komarê bi ziyar ve têtê biderkevtin û her tiştê ku ew ji bona partîyan û rêçan bi başî ve têtê biderkevtin, ew ji bona Komarê jî bi başî ve têtê bidîtin. Jibervêjî her yekekî ku ew Komarekê dikare bide bipeydakirin, divê ku ew dujminatîyan nehêle bêtin bidurustkirin û bi kêmanî ve ew nehêle, ku ew ji bona rêçan bêtin biveguheretin." (Mêjûwa Florens, Bergê Heftem).

## Derîyê Çarem

### Sînorên Deshilatîya Serwerîyê -Souveränität-

Heger dewlet yanî civat bes û bi tenha ve bi Kesekî Sincî ve bête biderkevtin, ku jîyana wîna di vegirêdana libatên wî de bi hev re têtê biderkevtin û hegerjî derdê wîyî giringtir di mayîna wî de têtê biermanckirin, weha dewlet bi hêzeke giştî û neçarî ve têtê bipêwistîkirin, da ku ew her perçeyekî xwe ji bona hemûyî bi şêweyekî pirlîhevkerî ve bide bilivandin û birêxistin. Mîna ku serûştî Merovan bi desthilatîyeke bêsinor ve li ser hemû libatên wî de dide bilidarxistin, wehajî Peymana Civakî jî Laşên Dewletê -Staatskörper- bi desthilatîyeke bêsinor ve li ser hemû libatên wê ve dide bilidarxistin û ew deshilatîya hanê bi xwe jî ve, ya ku ew ji bal vîna giştî ve têtê bigerandin, mîna ku hatîye bigotin, bi Serwer ve têtê binavkirin.

Ji bil Kesîtîya Dewletê em belê li Kesîtîyên Neferan de jî didin bitemaşekirin, yên ku ew wê Kesîtîya Dewletê didin bidurustkirin û jîyan û azadîya wan li gora serûştîyê de bi Kesîtîya Dewletê ve têtin bivegirêdan. Wer ji me re têtê bidivakirin, ku em rast û durust di navbera mafeyên beramberkirîyên Neşînvânên Dewletê û Serbixwe<sup>1</sup> de û herwehajî di navbera erkên wan de, yên ku Nişînvânên Dewletê nala Jêrdaran divên wan bidin bicîanîn, herwehajî di navbera mafeyên wanî serûştî de, yên ku ew nala Merovan divên ji xwe re bidin binoşandin, bidin bicudakirin.

Merov pê têtê birûniştin, ku di rêya Peymana Civakî de heryek ji desthilatîya xwe, ji malê xwe û ji azadîya xwe bes ji wî perçî têtê bidakevtin, ji yê ku ji civatê re bi pêwist ve têtê bidîtin; herwehajî divê Merov pê bête birûniştin, ku Serwer bi tenha ve pêwistîya perçê jêdakevtî dikare bide binîşankirin.

<sup>1</sup>Xwendevanê Jîr, ez ji te hêvîdarim, bi lez û bez ve li vêderê de nav bi dû min ve nede bixistin, ku ez xwe di nava dijûnekê de didim bidîtin. Li nik perîşanîya ziman de min nikarîbû xwe ji wê dijûna hanê bida birizgarîkirin; lêbelê ji xwe re bes û bi tenha ve çavdêrîya dawîbûnê bide bikirin!

### 43 Peymana Civakî

---

Ji bona hemû suxran, yê ku Neşîvanê Dewletê ji bona dewletê dibe bi wan ve bête birabûn, Neşîvan bi pêrabûna wan ve ji bona dewletê bi deyndar ve têtê biderkevtin, gava ku Serwer wan jê bidi bixwestin; biservajîvêjî ve Serwer nikare ji alîyê xwe de Jêrdaran bi hîç bendekê ne bi kar ve ji bona civatê bide bibendekirin, belê ew carekê jî nikare wê ji xwe re bide bixwestin, jiber ku li gora qanûna hişîtîyê û de herwehajî li gora qanûna serûştîyê de tu tişt bi bê hoyî ve nikare bête bikirin.

Vegirêdan, yê ku ew me bi Laşê Civakê -Gesellschaftskörper- ve didin bigirêdan, jibervêjî ve bes û bi tenha ve bi erkekî serûştî ve têtin biderkevtin, jiber ke ew bi beramberî hev ve têtin biderkevtin û cewhera wan wer têtê biderkevtin, ku Merov li nik bicîanîna wan de nikare ji bona Kesên din bide bikarkirin, herwehajî Merov nikare ji bona xwe jî bide bikarkirin. Jibervêjî vîna giştî hemîşe bi rast ve têtê biderkevtin û jibervêjî hemû timî bextiyarîya heryekê di nava xwe de didin bixwestin, hegerjî ne jibervêjî be, ku Kesek nayête bidîtin, yê ku ew ne ji xwe re gotina "heryekê" dide biwergirtin, lê ew pê li ser xwe de dide biramankirin, wer ew ji bona tevan dide bidengdan? Di vir de derkevtin têtê bidîtin, ku wekhevîna mafe û di rêya wê de jêderkevtina xewnê ji dadweryê ji bona qazanca xweyî taybetî di encam de ji serûştîya Merovan têtin biderkevtin: ku vîna giştî, heger ku ew bivê bi rastî ve bête biderkevtin, divê çî beramberî mebesta xwe û herwehajî beramberî cewhera xwe mîna xwe bête biderkevtin; ew divê ji tevan bête biderkevtin, da ku ew ji bona ser tevan bikaribe bête bikaranîn, ew dê rastîya xweyî serûştî bide biwindakirin, çî gava ku ew bes û bi tenha ve xwe ligel daneveke nîşankirîyî bi tenha ve bide bimijûlkirin, jiber ku em xwe ligel dadkirina rûdaneke bêgane ji me hîç li bal bingehekî rastîyî dadwerîyê de nahêlin bêtin birêberkirin.

Wêgava ku li nik deqeke hêjî ne rêxistîyî de li ser rûdaneke taybetî yanjî mafeyekî taybetî de di rêya lihevhatineke giştîyî berê de bête bireftarkirin, wêçaxê bi rastî ve dê li ser wê de bête bipevçûnîkirin. Li vêderê de pirseke mafeyî têtê biderkevtin, ya ku têtê Beşdarên wê ji Neferên bendekê û ji nivîsta civatê têtin bidurustkirin, ez ne wê qanûna, ya ku ew divê têtê bête bicîanîn û ne jî wî dadwerî, yê ku ew têtê divê bide bidadwerîkirin, didim bidîtin. Bi kenîn ve dê pê bête biderkevtin, gava ku Merov ji xwe re bide bixwestin, ku ew xwe di

rûdaneke wetov de bes û bi tenha ve li ser biryareke vîna giştî de bihêle bide bihiştin, ya ku ew belê bes û bi tenha ve bi biryara bendekê ve dikare bête biderkevtin û bi vî rengê hanê ve ew ji bona benda din bes û bi tenha ve nala vîneke bêganeyî taybetî bête biderkevtin û di vê kêsa hanê de ew bi ne dadwerîyê ve têtê bimêldarîkirin û ew bi şaşbûnê ve têtê bijêrdarîkirin. Wehajî mîna ku vîna teybatî nikare bête biderkevtin, ku ew ji bona vîna giştî bête biwênerîkirin, werjî vîna giştî jî ji alîyê xwe de serûştîya xwe dide biveguhertin, gava ku ew xwe ligel danevekî taybetî de dide bimijûlîkirin û ew nema dikare mîna vîna giştî ji bona ser Merovekî yanjî rûdanekê dadwerîyekê bide biderxistin. Ji bona nimûne gava ku Atîniyan Serokên xwe didan nîşankirin yanjî didan bihilanîn, wan ji bona yekî rûmet didan bigirtin û wan ji bona yê din siza didan bidanîn. Wan di rêya komekê ji biryaran de bi bêcudabûn ve hemû kar û barên dewletê didan birêvebirin, wer bi têgihîştina gotinê ve ji wan re nema bêtir vîna giştî dihate bidîtin; wan nema bêtir nala Serwer -Souverän- ve didan bireftarîkirin, lêbelê wan nala Karmendan didan bireftarîkirin. Ev dê wer bi diyar ve ligel têgihîştinên sade de bi dijbûn ve bête biderkevtin; xwezî Merov ji bona min bes demê bidin bihiştin, da ku ez bîr û bawerîyên xwe li ser van de bidim biderxistin.

Divê Merov bête biliberkevtin, ku bêtir kara giştî ji jimara dengan vînanan dindin bigiştîkirin, ya ku ew wan bi hev re dide biyekkirin; jiber ku di nava vê avanîya hanê de heryek xwe ji bona bin wan mercan dide biavêtin, yên ku ew wan li ser yên din de didin bicîanîn. Wetov lihevhatineke sipehîyî karan û dadwerîyê têtê biderkevtin, ya ku ew ji bona biryarîyên bi hev re rûçikekî rewayî didin bipêvekirin, ya ew ku li ser reftarkirina her kar û barekî Kesên taybetî de bi carekê ve têtê biwindakirin; jiber ku têtê tu kara giştî nayête bidîtin, ya ku ew dîtina Dadwer ligel dîtina bendê de di lihevhatinê û biyekkirinê de bide biderxistin.

Ji kîjan alîyî jî de Merov ji xwe re li bingehe biryara Peymana Civakî de bide bitemaşekirin, hergav Merov bi vê encama hanê ve têtê bigihaştin, ku Peymana Civakî di nava Neşînvânên Dewletê de wekhevîneke wetov dide bipêkanîn, ku hemû bi hev re beramberî wan mercan bi xwe ve didin bierkkirin û hemû bi hev re jî wan mafeyan bi xwe ve divên bidin binoşkirin. Li gora serûştîya peymanê

## 45 Peymana Civakî

---

de her pêrabûneke Serwerîyê dide bierkkirin yanjî rê pê didin bidan, ango her karekî pêrabûyî vîna giştî, hemû Neşîvanên Dewletê mîna hev têtin bierkkirin, weha ku Serwer bes û bi tenha ve bi Laşan - Körper- Netewe ve tète birûniştin û ji tevan jî ji yê ku wî dide bipêkanîn û ew hîç di navber yekekî ji wan de nade bicudakirin. Magelo bi rastî ve karê Serwer çiyê? Ev karê hanê ne bi lihevhatinekê ve di navbera Serdaran û Jêrdaran de tète biderkevtin; belam ew bi lihevhatinekê ve di navbera Laşan - Körper- û Libatan - Glieder- de tète biderkevtin. Ew lihevhatina hanê bi rewa ve tète biderkevtin; jiber ku ew ji xwe re Peymana Civakî dide bibingehkirin, ew bi rast û durust ve tète biderkevtin, jiber ku hemû jê pişka mîna hev ji xwe re didin biwergirtin, ew bi sûd ve tète biderkevtin; jiber ku ew bes û bi tenha ve ji bextiyarîya giştî ve dikare bête biderkevtin û ew bi hîmkirî ve tète biderkevtin; jiber ku ew ji bal hêza dewletê ve û desthilatîya bilind ve tète bipiştgirtin. Tanî dema ku Jêrdar bes û bi tenha ve xwe di bin qanûnên wergirtîyê de li jêr lihevhatinên wisa de didin bidîtin, ew ji tu kesekî re serên xwe nadin bitewandin; lêbelê ew bes û bi tenha ve serên xwe ji bona vîna xwe didin bitewandin. Tanî çî dûrbûnê mafeyên Serwer û Neşîvanê Dewletê ligel hevdû de têtin biçûyîn, evaya bes û bi tenha ve vê pirsê dide biderxistin, tanî kuderê Neşîvanê Dewletê beramberî xwe, her yek beramberî tevan û tev beramberî heryekî dikarin li ser xwe de bidin bierkkirin.

Bi vî rengî ve tète bidîtin, ku desthilatîya Serwerî gerjî wehajî bêsînor, perest û nebirîndarkirî jî tète biderkevtin, ew nikare xwe ji sînorê lihevhatina giştî ve bide biderxistin û her Merovek li ser yê ku jê re di rêya vê lihevhatina hanê de ji perçê mayî ji malên xwe û azadîya xwe bi carekê ve bi bêbergirî ve dikare xweddarîyê bide bikirin, wisa ku ji Serwer re tucarî mafe neyête bidîtin, ku ew Jêrdarekî bi xurttir ve ji yekekî din bêtir bide biberbarkirin; jiber ku dê ev karê hanê bi karekî xweyîyî taybetî ve bête biderkevtin, yê ku biryarîya wîna ne di nava desthilatîya Serwer de tète bikevtin.

Di wergirtina vê cudabûna hanê de vegotina devjêberdaneke bi rastî ve ji bal alîyên yekayekan de ji Peymana Civakî weha bi şaşî ve tète biderkevtin, Lêbelê hêjbêtir bi vî rengê hanê ve rewşa wan bi bingehî ve beramberî rewşa wanî berê li ser encamê vê peymana hanê de bi diyar ve dikare bête bidîtin. Ji dêlva jêdakevtinekê wanan bes û bi

tenha ve veguhertineke bi sûd ve dane bikin, ku têde wan ji bona şeweyê jîneke nearamî û neji girawkirî bi jîneke baştir û girawkirî ve, bi azadîyeke serbixweyî serûştî ve, bi desthilatîyê ve, da ku ew zîyanê bi yên din ve bidin bigihandin, bi parastina xwe ve û ji bona hêza xwe ve, da ku ew zora yên din bikaribin bidin bikin, bi mafeyekî ve bidin biveguhertin, yê ku ew biyekkirina civakê nahêle bête bişikenandin. Belê jîna wan jî, ya ku wan ew ji bona dewletê dane bisipartin, dê ew ji bal wê ve hergav bête biparastin. Ma dê ew çibikin, gava ku ew jîna wan ji bona liberxwedana xwe ber bi metirsîyê ve bide bixistin, bi şeweyekîtir ve, magelo dê çi bête bikin, gava ku ew ji bona wê bidestkevtina xwe jêre careke din bidin bivegerandin? Magelo dê ew di zîmeta serûştî de ne deha bêtir wê canbêzarîyê pir caran û bi metrsiyeke mezintir ve divên bidin bikin, gava ku ew wê canbêzarîyê ji bona pêwistîya parastina jîyanê di pevçûnên neçar de di bin mercên metirsîya nemana jînê de li ber bidin bidan? Di tengavîyê de belê hemû ji bona liberxwedana welatê xwe divên bidin şbierkirin; belam ji bona tu Kesekî pêwist niye, ku ew bes ji bona xwe bide bişerkin. Magelo jê ji me re bêtir kar nayête biderkevtin? Heger ku em ji bona wê bi destkevtinê ve, ya ku ew parastina me dide biavakirin, ji bona bin hin metirsîyan bêtin bikevtin, ji yên ku em bivên yanjî nevên dê ber bi wan ve bêtin bikevtin, çi gava ku ji ser me her parastinek bête bihilanîn.

## Derîyê Pêncem

### Mafeyê li ser Jîyan û Mirinê de

Merov dide bipirskirin, bê çawan heryek, yên ku belê hîç mafeyek ji wan re nayête bidîtin, ku ew xwe bidin bikuştin, vî mafeyê hanê bi xwe bikaribin ji bona Serwer bidin bidan, yê ku ew bi mafeyê wan ve nayête biderkevtin? Çarekirina vê pirsê hanê bes û bi tenha ve jîbervêjî bi dijwarî ve tête bidiyarkirin, jiber ku ew bi şêweyekî nebaşî ve hatîye bikirin. Her Merovek bi mafeyê wî ve tête biderkevtin, ku ew jîyana xwe ber bi tirsê ve bide bixistin, da ku ew wê bide biparastin. Magelo Merov hîç carekê Merovekî, yê ku ew xwe ji pencerê dide biavêtin, da ku ew xwe ji nava virîna agir bide birizgarîkirin, bi mebesta kuştina xwe ve dide bitawanbarîkirin? Magelo Merov ev tawankariya hanê carekê ji caran bi hustê Merovekî ve dayite bixistin, yê ku ew di nava tofanê de hatîye bikuştin, tevî ku jêre di geştê keştîyê de metirsîya tofaneke wisa dihate bidiyarkirin?

Peymana Civakî parastina jîna Morkirvanên wê dide biarmanckirin. Kî armancê dide bixwestin, wehajî ew bi destikan ve tête birûniştin, tevî ku ev destikên hanê jî xwe ji metirsîyê û herwehajî xwe ji hin windakirinan tucarî nikarin bidin bicudakirin. Kî jîna xwe li ser kîsên yên din de bixwaze bide biparastin, divê ew jî wê di dema pêwistîyê de ji bona parastina jîna yên din bide bigorîkirin. Neşîvanê Dewletê jîbervêjî ve nema bêtir bi Dadvanê xwe ve di beramberî metirsîyê de tête biderkevtin, ya ku ew xwe jê re li ser daxwaza qanûnê de divê bide bixistin; û gerjî Mîr jêre bide bigotin: "Mirina te ji bona parastina dewletê tête bipêwistîkirin", weha divê ew bête bimirin, jiber ku ew bes û bi tenha ve li ser bingehe vî mercê hanê çûyî de di asayîşê de dihate bijîyandin û jîyana wî nema bêtir bes bi qenciya karê serûştîyê ve tête biderkevtin, lêbelê jîyana wî bi diyariya ve jêre tête biderkevtin, ya ku ew ji bal dewletê jêre di bin mercên taybetî hatîye bidiyarîkirin.

Derkirina sizadana mirinê beramberî Tawankaran dikare tanî radeyekî weha li jêr nala wan deqên dîtinê lêbêtin bitemaşekirin. Da ku Merov

bi xwe jî ve bi jêr destên Tawankarekî ve neyête bikevtin, Merov pêrûniştina xwe dide bidan, ku ew bi xwe jî ve bête binabûdkirin, heger ku Merov bi yekekî wetov ve hate biveguhertin. Jidêlva ku Merov li nik vê peymanan hanê de xweddariya jîna xwe bi destên xwe ve bide bixistin, Merov bes û bi tenha ve li ser de tete bilihevhatin, ku jîna xwe bide biparastin; bi her awayekî ve Merov nikare bide bidanîn, ku hîç Kesekî ji Morkirvanên peymanê di pêşekî de tede hatîye biremankirin, ku ew xwe bihêle bide bidarvekirin.

Li ser vena çuyî de her Tawankarek, yê ku ew mafeyê civakî dide birîndarkin, di encamê tawankariya xwe de di berrabûnê û bêbextiya welêt de, di rêya pêlêkirina qanûnên wî de ew ji aliyê xwe de tîne bidawîkirin, ku ew nema nala Endamê civakê tete biderkevtin û hêjîbêtirjî ew beramberî wena cengeke vekirî dide bilidarxistin. Bi vî corê hanê ve mayîna dewletê ligel mayîna wî de nayête bilihevkin; yek ji herduwan divê bête binemankirin. Gava ku Merov Tawankarekî bi sêpiyê ve dide bivekirin, wisa ew ne nala Neşîvanekî Dewletê, lêbelê ew nala Dujminekî tete bimirin. Belgehên dadkirinê û biryara dadkirina wîna bi nîşan ve têtin biderkevtin û ew didin biderxistin, ku wî Peymana Civakî dayite bişikenandin û di encam de ew nema bêtir bi Endamê dewletê ve tete biderkevtin. Jiber ku wî xwe wetov, yanjî di rêya mêvandarîya xwe de jî, beramberî Peymanan Civakî dabû bierkkirin, weha divê ew nala Peymanşikenandvan di rêya derkirinê de yanjî di rêya nala Dujminê Serdariyê de di rêya mirinê de bête biavêtin; jiber ku Dujminekî wisa ne bi Kesekî Sincî ve tete biderkevtin û nejî ew nala Merovekî tete biderkevtin û di bin van zînetên hanê de kuştina Şikestinvanan bi mafeyê cengê ve tete dbierkevtin.

Merov dide bigotin, ku sizadana Tawankarekî bi karekî Kesîtî ve tete biderkevtin, em bi vê gotina hanê ve têtin birûniştin. Ev sizadana hanê bi Serwer ve nayête bigirêdan; belam mafeyê wî heye, ku ew dikare wî mafeyê hanê bi Karmendên xwe ve bide bisipartin, di gava ku ew bi xwe ve nikare bi wî mafeyî ve bête birabûn. Hemû remanên min bi rêk û pêk ve bi hev re têtin bigirêdan, gerjî ku ez jî nikarim, tevan bi hev re bi yekcarê ve bidim bidaverişandin.

Pirbûna vegerandinê ji sizandanên mirinê hergav bi nîşaneke lawazî û sistîya Serdariyê ve tete biderkevtin. Hîç Bedkarek nayête bidîtin, ku



## 49 Peymana Civakî

---

Merov wî biçekî nikare bide bibaşîkirin. Merov mafedar nayête bidîtin, ku ew Kesekî bide bikuştin, herwehajî nejî carekê jî da ku ew bi nimûne ve bête biderkevtin, lêbelê bes û bi tenha ve gava ku jîyandina wîna metirsîyê li ser civakê de bide bikin.

Mafeyê lêbuhurandinê yanî azadkirina Tawankaran, yên ku ew di rêya qanûnê de hatinê binîşankirin û ew ji bal Dadvanan de hatine bitawanbarkirin, bes û bi tenha ve bi wî Kesî ve tête bigirêdan, yê ku ew di ser Dadvanan û Qanûnê re tête bidîtin, ango ev bi Serwer ve tête bigirêdan; lêbelê mafeyê wî di vir de ne bi carekê ve bi diyarî ve tête biderkevtin û ew dê wî di zînetên pir kêr de ji xwe re bide bikaranîn. Di nava serdarîkirineke başî dewletê de kêr tawankarîkirin têtin biderxistin, ne jiber ku mafeyê lêbuhurandinê bi pîrbûn ve tête bikaranîn, lêbelê jiber ku kêr Tawankar têtin biderkevtin. Pîrbûna jimara tawankarîyan bêtawankarîkirina wan dide bigirawkirin, wê gava ku dewletek berê xwe ber bi nemê ve dide bivekirin.

Der Komara Roma de ne Konsulên wê û nejî Civata Sinatên wêna tucarî xwe ji bona lêbuhurandinekê nedane biêşandin; herweajî Gel jî bi xwe jî ve lêbuhurandin nedida bikin; gerjî wî carcaran jî derxistina dadkirina xwe didate bivegerandin. Pîrbûna lêbuhurandinan didin binasîn, ku Merov ji bona tebahkarên xwe bi niyazmendîya lêbuhurandinê ve tête bihestkirin û her Kes dide bidîtin, ku evaya bi kuderê ve dide bijotin. Bes ez didim bihestkirin, ku dilê min bi xurtî ve dide bilêxistin û ew xameya min di nava destên min de dide birawestandin; em dixwazin peyivandina li ser van pîrsên hanê ji bona Dadwerekî bidin bihiştin, yê ku wî tucarî gunehek nedaye bikin û hîç carekê jî bi xwe jî ve dê ew niyazmendî lêbuhurandinê neyête bikin.

## Derîyê Şeşem

### Ji Qanûnê

Di rêya Peymana Civakî de me ji bona Serwer ji bona hebûnê û jînê date biyarmetîkirin; nihajî li ser de tête birawestandin, da ku wî di rêya qanûnguzarîyê de bi hêza kirinê û vîna kirinê ve bidin bicankirin. Jiber karê pêşî, yê ku ew xwe di rêya wî de dide bipêkanîn û bivegirêdan, hêjî ew li ser de nade binîşankirin, bê ka ew çî ji bona mayîna xwe divê bide bikirin.

Bi xwe başî, rêk û pêkî bes û bi tenha ve di rêya serûştîya tişt re tête bidîtin û niyaza wî bi lihevhatinên merovanîyê ve nayête bivegirêdan. Hergone dadwerî ji bal Xwedawend tête bidakevtin, ew bes û bi tenha ve bi serçavî wê ve tête biderkevtin; gerjî ji me re kês bihata bidîtin, ku em wê xweser ji jor ve ji xwe re bidin biwergirtin, wisa nema niyazîya me dê bi serdarîyê ve û nejî bi qanûnan ve bihata bidîtin. Bêgûman dadwerîyeke giştî tête bidîtin, ya ku ew bes û bi tenha ve ji hiş tête biderkevtin; bes da ku ew ji bal me de pê bête birûniştin, divê ku ev dadwerîya hanê bi beramberî ve bête biderkevtin. Heger Merov ji xwe re li tiştan de ji deqadîtina merovanîyê bide bitemaşekirin, weha qanûnên dadwerîyê bi xwe di kêmanîyeke serûştîyî pêrûniştî de di nava Merovan de bi carekê ve bêkêr têtin biderkevtin; ew bes û bi tenha ve ji bona kara Bedkar û zîyana Piştvanê Mafe didin bikarkirin, gava ku Piştvanê Mafe wan beramberî heryekî dide bikaranîn û gava ku tu Kes wan beramberî wî nade bikaranîn. Wetov pêwistî bi hin lihevhatina qanûna ve tête biderkevtin, da ku mafe ligel erkan bêtin bilihevkirin û dadwerî ji bona ser berên xwe bête bivegerandin.

Di zîneta serûştî de, ya ku têde hemû bi hevbeşî ve tête bidîtin, min ji tu Kesekî re tişteke nedaye bisozkirin û jibervêjî ve ez beramberî tu Kesekî bi deyindar ve nayêm biderkevtin; ez bes û bi tenha ve wî tiştî ji bona yekekî din didim bidan, yê ku ew ji bona min bê sûd tête bidîtin. Di zîneta civakî de, ya ku têde hemû mafe di rêya qanûnê têtin binîşankirin, bi wî corî ve nayête biderkevtin.

Lêbelê di dawîya dawî de magelo qanûn çiyê? Tanî ku Merov wê bes

û bi تنها ve bi gotina têgihiştina Mitaphysisch -pişt Serûştîyê- bide bikaranîn, hîç gavekê danava wêna nayête birewşenkirin û gerjî Merov bikaribe bide bigotin, bê ka qanûna seruştî çiyê, tevlivêjî de dê Merov nikaribe bide bizanîn, bê ka qanûna dewletê çiyê?

Der pêş de min dayite bigotin, ku li ser danavek taybetî de hîç vîneke giştî nayête bidîtin. Ev danava taybetîyî hanê bes û bi تنها ve bi dewletê ve tete bivegirêdan yanjî ew bi wê ve nayête bivegirêdan. Ew bi dewletê ve nayête bivegirêdan, Weha vînek, ya ku dewlet tede ne bi beşdar ve tete biderkevtin, nikare beramberî dewletê jî bi giştî ve bête biderkevtin; belam heger ku ew danava hanê bi dewletê ve bête bivegirêdan, belê weha ew jê pişkekê dide bidurustkirin. Wetov di navbera beşê tevde û pişka wî de pêwendîyek tete bipêkhatin, ya ku ew du beşê cuda ji wan dide bidurustkirin, ku heryekê ji wan beşekî dide bidurustkirin û ev beşê hanê bi xwe jî ve ji beşê tevde dide bikêmkirin. Heger ku ji beşê tevde jî beşek hate bikişandin, ew nema bi beşê tevde ve tete biderkevtin û tanî ku ev pêwendîya hanê bête bidirêjkirin, nema bêtir beşekî tevde tete bidîtin, lêbelê du beşên nemîna hev di perçên xwe de têtin bimayîn. Jivêjîve tete biderkevtin, ku vîna yekî beramberî bi vîna yekekî din ve tevlivêjî ve bi giştî ve nayête biderkevtin.

Lêbelê di gava ku tevaya Milet li ser tevaya Milet de bide bibiryardan, ew bes û bi تنها ve guh bi xwe ve dide bidan û pêrejî weha pêwendîyek xwe dide bidurustkirin, weha bêyî ku ew hîç perçekirineke tevdeyî bide bidurustkirin, bes û bi تنها ve ew di navbera tevaya danavê de li jêr dîtinekê de û di navbera tevaya danavê de li jêr dîtineke din de tete bipêkhatin. wê gavê ew danava hanê, ya ku Merov li ser de dide bibiryardan, wetov bi giştî ve nala vîne tete biderkevtin, Vîna ku ew wê dide bibiryardan û vî karê hanê bi xwe jî ve ez bi qanûnê ve didim binavkirin.

Gava ku ez didim bigotin, ku danava qanûnan hemîşe bi tevayî ve tete biderkevtin, weha ez pêdidim bimebestkirin, ku qanûn Jêrdaran bi giştî ve û pêrabûnan bi xwe jî ve li ber çavên xwe de didin bidanîn, bi servajîvêjî ve ew tucarî Merovekî nala yekekî û herwehaji tucarî jî pêrabûneke taybetî li ber çavên xwe de nadin bidanîn. Li gora vîna de belê qanûn dikare bide binîşankirin, ku di serhevgerîtin re dikarin bêtin bipeyda kirin, belam ew nikare wan ji bona Merovekî bi nakirî ve bide

bidan. Qanûn dikare gelek çînyên Neşînvânê Dewletê bide biafirandin û hêjbêtir ew taybetîyan bide bidanîn, ji bona yên ku ew ji bona nava van çînyan dikarin bêtin bikevtin, belam ew nikare wergirtina vî Kesî yanjî filan Kesî di çînyekê de bide bifermankirin. Ew dikare Serdarîyeke Padîşahê û Cîneşînyeke Dondeyî ji bona ser Textê Srdarîyê bide binîşankirin, belam ew nikare Padîşahê bide bihelbijartin û nejtî ew dikare Malbateke Padîşahî bide binavkirin. Bi gotinekê ve: Pêrabûna her karekî vegirêdayî bi Neferekî yekane ve ji desthilatîya Qanûndanînvanan ve hatîye bikişandin.

Li ser bingehê vê nerîna hanê de Merov xweser dide bidîtin, ku Merov nema ji bona pîrskirinê tete biniyazmendîkirin, bê bi kê ve qanûn tete bigirêdan; jiber ku qanûn bi karê vîna tevayî ve têtin biderkevtin, herwehajtî nejtî tete bipîrskirin, magelo Şahzade di ser qanûnan re tete biderkevtin, jiber ku ew jî bi Endamê dewletê ve tete biderkevtin, hêjkêmtir nayete bipîrskirin, magelo qanûn dikare bi bêdadwerî ve bête biderkevtin, jiber ku hîç Kes bi beramberî xwe jî ve bi bêdadwerî ve nayete biderkevtin û herwehajtî nejtî gerjtî ku Merov ji alîyekî de beramberî qanûnan him azad û himjî sertewandî tete biderkevtin, jiber ku ew qanûnê hanê bes û bi tenha ve navrokên vînen bawerîyên me didin biderxistin.

Hêjdûrtir tete bidîyarkirin, jiber ku qanûn tevaya vîne dide biderxistin, ya ku ew danavê bi hev re dide bivekirin û jiber ku derxistina fermandarîyekê ji bal Merovekî, dibejî ku ew kîjtî bête biderkevtin, tucarî ew bi qanûnê ve nayete biderkevtin, wehajtî gerjtî çî Serwer li ser daneveke tekanejtî de bide bifermandarîkirin, wetov ew bi qanûnê ve nayete biderkevtin, lêbelê ew bi fermandarîyeke Fermandarîyê ve tete biderkevtin û wisa ew bi karekî Serwerîyê ve nayete biderkevtin.

Jibervêjtî ez her dewletekê ji bal qanûnan ve serdarîkirî bi Komarê ve didim binavkirin, gerjtî çijî rengê Serpereştîyê jî bête bidîtin, ya ku ew ji xwe re dide bixwestin; jiber ku bes û bi tenha ve der vê zîmeta hanê de kara dewletê tete biparastin û her kar û barek nala kar û barê dewletê tete binîşankirin. Her Serdarîyeke rewayî bi Komarî ve tete biderkevtin<sup>1</sup>. Bê ka Serdarîyek çîye, dê ezê wê di pişt re jî bidim

<sup>1</sup>Ez di bin vê peyva hanê de ne bes bi Komareke Aristokratî yanjî Demokrasî têtîm biliberkevtin, lêbelê bi her Komarekê ve têtîm biliberkevtin, ya ku ew ji bal Vîna

bixuyanîkirin.

Qanûn bi rastî jî ve bes û bi tenha ve mercên avanîkirina civakîyî dewletê didin biderxistin; Miletê, yê ku ew li jêr saya qanûnan de tête bijîyandin, divê ew bi xwe jî ve bi sazendeyê wan ve bête biderkevtin; bes û bi tenha ve ji wan re tête bidîtin, yên ku ew xwe di nava civakekê de didin biyekkirin, ku ew mercên civakê bidin birêkûpêkxistin. Belam çilo divên ew wê bidin birêkûpêkxistin? Magelo dê ew wê li ser lihevhatineke tevayî de di encamê remaneke dakeftî de ji nişkê ve bidin bikirin? Magelo Laşê -Körper- siyasî destikekî dare, da ku ew vînen bawerîyên wî bidin biderxistin? Çi Kes dê bikare wî bi pêwistîyên daxwazkirî ve bide bixemilandin, da ku biryaran di pêşekî de bidin binivîsandin û wan bidin bidazanîn, yanjî dê çawa ew wan bide biderxistin, gava ku ew xwe bi pêwistî ve bidin bikirin? Çawan dê komeke kor, ya ku ew pir caran nizane, bê ka ew çî dide bixwestin, jiber ku ew kêr dizane, bê ka çî jêre bi başî ve tête bidîtin, xwe bikaribe bide bidîtin, pêrabûneke wetov mezin û wetov tevlihev nala rêstikekê ji qanûnguzariyê bide biencamkirin? Ji xwe re Milet hemîşe başiyê dide bixwestin, belam ew hemîşe wê ji xwe re nade binaskirin. Vîna tevayî hemîşe rast tête biderkevtin, Lêbelê bi tenê ve biryar, ya ku ew vîna tevayî dide birêvebirin, ne hemîşe bi têrbûn ve rewşen tête bidîtin. Merov divê jêre danavan wetov bihêle bide bidîtin, nala ku ew têtin bidîtin, tanî radeyekî wetov mîna ku ew jêre divên bêtin biderkevtin. Merov divê jêre rêya rast bide binîşandan, ya ku ew ji xwe re lê dide bigerandin. Merov divê wê ji xapandinê di rêya vîna yekane de bide biparastin. Merov divê jêre wargehan û deman nêzîktir li ber çavan de bide bidanîn û jêre navtêdana niha û pêşbînîya berjewendîyan di rêya metirsîyên dûr de û bedkarîyên poşandî de bide bitirazûkirin. Yekane başiyê didin bidîtin, ya ku ew wê didin biavêtin, Tevayî başiyê dide bixwestin, ya ku ew wê nade bidîtin. Hemû bi hev re mîna hev niyazmendî yekekî dibin, yê ku ew ji

---

tevayî ve ango ya ku ew ji bal Serdarîyekê tête biderkevtin, Serdarîya ku ew ji bal qanûnê tête birêvebirin. Da ku Serdarî bi rewayî ve bête biderkevtin, divê ku ew ligel Sewer de bi yek ve neyêtin biderkevtin, lêbelê divê ku ew bi Nokera wî ve bête dbierkevtin; wêçaxê jî dê Padîşahî jî bi xwe jî ve bi Komarî ve bête biderkevtin. Vêna ez dê di nivîsta din de bixwazim bidim bidiyarkirin.

bona wan rêyê dide binîşandin. Ji bona yekanan divê Merov li ser wan de bide bineçarîkirin, ku ew vînên xwe li gora hiş bidin bikirin. Ji bona tevayê divê Merov wê ji bona nasîna wî tiştî bide bigihandin, yê ku ew wî ji xwe re dide bixwestin.

Wêçaxê di Laşê Civakê de -Gesellschaftskörper- ji dîtina giştî yekbûna biryarê û vînê tête biberzkirin û di encamê vêna de rast û durust bihevkerîna beşên yekane bi hev re û di dawî de berztirîn hêza giştî tête bidîtin. Ji vê bi neçarî ve Qanûnguzarek tête biderkevîtin.

## Derîyê Heftem

### Qanûnguzar -Gesetzgeber-

dide bitewandin, bi peymanekê ve nayête biderkevtin, tanî radeyekî ew rast dibêjin. Evaya bes û bi tenha ve pêsiptartineke, karmendîyeke ku Karmendên sadeyî Serwer bi navê wî desthilatîyê didin bikin, karên ku wî bi wan ve dayite bisiptartin û yên ku ew wan karan, heger ku kêfa wî xwest, dikare bide bisînorkirin, veguhertin û bicarekê ve bide bikişandin. Jiber ku jêdakevtineke wetovîyî mafeyî ligel serûştîya dam û destgehê civakê nayête bilihevkirin, weha ew dijî armanca bi hevgerêdana civakê ve tete biderkevtin.

Mîna serdarîyê yanî Serpereştîya Bala ez weha birêvebirina mafeyî ya Desthilatîya Bicîanînê didim binasîn û Mîr yanî Fermanrewayê ez wî Merovî yanî wan Merovan didim binavkirin, yên ku ew bi vê Serpereştîyê ve hatine bisiptartin.

Di nava serdarîyê de hinerên navcîtiyê xwe didin bipeydakirin, yên ku pêwendîyên wan endazîya giştî ligel giştî de û endazîya Serwer ligel dewletê de didin bidurustkirin. Ev endazîya dawî Merov dikare nala endazîyekê bide binîşankirin, ya ku ew hemîşe herdu Libatên derve bi hevrêjîyekê ve ligel hevdû de dide biderxistin, ya ku dabeşka hevrêjîya wêna bi Serdarîyê ve tete biderkevtin. Serdarî ji bal Serwer fermanan dide biwergirtin, ya ku ew di nava Milet de dide bibelavkirin; da ku dewlet tirazuwa xwe bikaribe bide biragirtin, divê hemû bête bihejmarîkirin, divê di navbera berkirinê yanî desthilatîya serdarîyê de bi serê xwe ve û di navbera berkirinê yanî desthilatîya Neşînvanan de, yên ku ew ji alîyekî de bi serwerî ve û ji alîyê din de bi jêrdarî ve têtin biderkevtin, wekhevbûn bête bimayînkirin.

Hêjîbêtir Merov nikaribe yekekê ji van hersê Libatan bide biveguhertin, bêyî ku di cih de endazîyê bide bitarûmarkirin. Heger Serwer bide sardarîkirin yanî Fermanrewayî qanûnan bide biderxistin yanî Jêrdar sertewandinê bidin binayînkirin, weha bi rêzan ve şer û hera têtin bivêkevtin. Desthilatî û vîn nema bêtir bi hev re bi başî ve didin bikarkirin û dewleta jihevkevtî bi vî şeweyê hanê ve ji bona nava destê Zordarê bi serê xwe ve yanî ji bona nava serberdabûnê tete bipengizandin. Wetov mîna ku di her endazîyekê de bes û bi tenha ve dabeşeke hevrêjî tete bipeydakirin, wehajî bi vî corîjî ve di nava dewletekê de serdarîyek baş tete bipeydakirin. Belam jiber hezarûyek rûdanan endazîyên Miletê dikarin xwe bidin biveguhertin, weha serdarîyên cudan nebes tenê ji bona Miletên cudan lêbelêjî ji bona yek

Miletî di demên cudan de dikarin bi başî ve û bi sûd ve bêtin biderkevtin.

Ji bona ji van pêwendîyên cudan, yên ku ew dikarin di navbera Libatên derve de bêtin bipeydakirin, tanî radeyekî remaneke diyar bête bidan, ez dixwazim serjimara Miletê nala nimûneyekê bidim bianîn, jiber ku ew bi hêsantirîn ve pêwendîyên derkevtî de dide biderxistin.

Em didin bidanîn, ku dewlet ji dehhezaran Nefer tete bipêkhatin. Serwer dikare bes û bi tenha ve di tevayê de û di giştî de lêbide bitemaşekirin; heryekê din bi servajîvêjî ve nala Jêrdarekî ji bona xwe bi tenê ve ji bona temaşekirinê tete biderkevtin. Li ser vê de Serwer reftara xwe beramberî Jêrdaran mîna dehhezaran beramberî yekî dide bikirin. Ev dide biderxistin, ku her yek ji Libatê dewletê bes û bi tenha ve navekî ji dehhezaran navên desthilatîya Serwer ji xwe re dide biwergirtin, tevî ku ew jî bi carekê ve li jêr desthilatîyê de tete bidîtin. Merov bibêje, ku Milet ji sedhezaran Merovan tete bipêkhatin, wetov cihê Jêrdaran bi vî rengî ve xwe nade biguhertin û heryek mîna hev tevaya serdarîya qanûnan dide bihilgirtin, di dema ku dengê wî ji bona ser sedhezaran nav de li nik nivîsandina qanûnan de û yek ji dehan kêmtir kêrê dikare bide bikirin. Di dema ku belê Serwer hemîşe bi yek ve tete bimayîn, weha endazîya Serwer bi pîrbûna serjimara Neşîvanên dewletê ve tete bimezinkirin. Ji vê tete dbierkevtin, ku azadî bi mezinbûna dewletê ve tete bikêmkirin.

Gava ku ez dibêjim, ku endazî tete bimezinkirin, weha ez di bin de têtîm biliberkevtin, ku ev xwe ji wekhevîyên dide bidûrkirin. Weha her ku endazî bi têtîhiştina jimargarî ve bi mezintir ve bête biderkevtin, wetov ew di karanînê de bi biçûktir ve tete biderkevtin. Di têtîhiştina pêşî de dê li gora endazîya jimarê lê bête bitemaşekirin û bi alîkarîya çarkirinan ve dê bête bipîvandin. Ligel yê dawî de li gora hebûna wîna de dê lê bête bitemaşekirin û li gora wîna de dê bête bitexmînkirin.

Herçend vîna yekanan ligel vîna tevayî kêmtir bête biderkevtin, ango ku herçend reweşt kêmtir ligel qanûnan de bête bisuwarîkirin, weha deha divê yektîya hinera fermanê bête bêtirkirin. Weha divê Serdarîyek, da ku ew bi başî ve bête dîtin, deha bêtir xurtir bête biderkevtin, herçend Milet bi jimartir ve bête biderkevtin.

Jiber ji alîyê din de mezinbûna dewletê ji bona Serpereştvanên



desthilatîya dewletê bêtir dilbijandinê û karinê dide bipêşkeşkirin, da ku ew desthilatîyê bi nebaşî ve bidin bikaranîn, weha divê Serdarî desthiltîyeke mezin ji xwe re bide biwergirtin, da ku ew Milet di nava sînorên wî de bide bihiştin û herwehaji daku Serwer ji alîyê xwe de jî bikaribe Serdarîyê bide bihevsarîkirin. Ez li vê derê de ne li ser bêsi-norkirineke desthilatîyê didim biaxivtin, belam li ser endaziya desthilatîya perçeyên cudayî dewletê ez didim biaxivtin.

Ji van herdu pêwendîyên ducarî tete biderkevtin, ku hergav hevrêje di navbera Serwer, Mîr û Milet de nebes tenê bigir bi remaneke dilbijandî ve tete biderkevtin, lêbelê ew bi encamê pêwistîya seruşîya dam û destgehên -Korper- siyasî ve tete biderkevtin. Hêjbêtir ji vê tete biencamkirin: ku Libatekî derveyî, yê ku bi rastî jî ve bi Miletê nala Jêrdaran ve tete biderkevtin, bi mayîneke mîna xwe ve tete bimayîn, belê ku bi yekê ve tete biderkevtin, weha divê, gerjî çend pêwendîya ducarî jî bête bibêtkirin yanjî kêmkirin, hevrêja sade bi wî rengî jî ve bêtkirin yanjî kêmkirin û di encam de dê Libatê dabeşkê jî bête biveguhertin. Ev dide bieşkerekirin, ku bi serê xwe ve hîç ne destura Serdarîyekê zor baş û bi neçarî ve baş tete bipeydakirin, lêbelêjî weha pir serdarî li gora cewhera xwe de dikarin cudan bêtin biderkevtin, mîna ku li gora mezinbûna wan jî de dewletên cudan bêtin biderkevtin.

Heger Merov vê rêstika hanê ber bi pêkenînê ve bide rakîşandin û bide bigotin, ku Merov, da ku ew vê dabeşka hevrêjê bide bidîtin û dam û destgehên serdarîyê bide bidurustkirin, li gora eşkerekirina min bes û bi tenha ve bi derxistina reha çarînkirinê ve ji Serjimarê tete bipêwistîkirin. Bersiva min wetov dê bête bivegerandin, ku ez vê jimara hanê bes ji bona nimûne bi tenê ve didim biwergirtin; ku pêwendî, yên ku ez li ser wan de didim biaxivtin, xwe ne bes bi tenha ve li gora jimara Merovan de dihêlin bêtin bijimarîkirin, lêbelê ew bi giştî ve xwe li gora çendûna kirinan de didin biderxistin, yên ku ew xwe ji komeke hoyan didin biderxistin. Hêjbêtir gerjî ku ez ji bona bêhnekê ji bona jimargarîyê hin peyvan pêve bidim bisipartin, tevliwêjî de ez baş dizanim, ku li nik hişdarîyên mezin de hîç girawkirinên jimargarîyê nikarin bête bidan.

Serdarî di biçûkbûnê de tete biderkevtin, çiyê dam û destgehên siyasî, yên ku ew di nava xwe de ji xwe re didin biwergirtin, bi mezin

ve tète biderkevtin. Ew caneke, ya ku ew tanî radeyekî ji bona Kesekî bi karînan ve hatîye bilidarxistin, ew bi jêhatî ve nala Serwer û bi bêliberxwedan ve nala dewletê ve tète biderkevtin, herwehaji ew bikarîn ve tète biderkevtin, ku ew di nava pêwendiyên din de ji hev bide bivekirin. Jê hevrêjîyeke nuh tète bipeydakirin û di vê de hemîşe careke din yekeke din tète bidurustkirin, li gora kenalê wêyî mîrî de tanî ku Merov di dawî de bi dabeşeke xweser ve tète bigihaştin, ango bi yek Serokî ve yanî bi yek berztirîn fermanrewayekê ve tète bigihaştin, ya Merov dikare ji xwe re di nava vê çûna hanê de nala yekekê di nava rêza şikestîyan û yekekê di nava jimarên de bide biremankirin.

Da ku em xwe di rêya pîrbûna peyvan de nedin bigêjkirin, em dixwazin xwe pê bidin bitêrkirin, ku em li serdarîyê de nala dam û destgehekî -Körper- nuh di dewletê de lê didin bimeyzekekin, yê ku ew ji Milet û herwehaji ji Serwer tète bicudakirin û ew nala Navcîvanekî di nava herduwan de tète biderkevtin.

Di nava van herdu dam û destgehan -Körper- cudabûneke diyar tète bipeydakirin, ku dewleta di rêya xwe de û Serdarî bes di rêya Serwer de tète bihebûnkirin. Bi vê ve vîna zalbûyî Mîr bes û bi tenhave yanî divê bi kêmanî ve bes nala vîna tevayî yanî nala qanûnê bête biderkevtin. Desthilatîya wî bes û bi tenha ve ya ku di wî de yektîya desthilatîya dewletê tète biderkevtin; çî gava ku ew ji hinera xwe li gora kêfa xwe de û azad karekî bixwaze bide bikirin, girêdana giştî dest bi sistbûna xwe dide bikirin. Gerjî werjî bête bikirin, ku Mîr daxwazeke wîyî taybetî tète bidîtin, ya ku ew dixwaze wê bide bicîanîn, mîna ku bi Serwer ve tète biderkevtin û ew ji bona bi cîanîna wêna desthilatîya dewletêyî di nava destên xwe de bide bikaranîn, da ku ew ji bona vê daxwaza taybetî sertewandinê bide bipeydakirin, weha mîna ku Merov di yek carê de bi xwedan du Serok ve bête biderkevtin, Yekek li gora mafê de û yê din li gora kirinê tète bidîtin, wisa dest bi cî ve yekîtîya civakê dê bihata bihilanîn û dê dam û destgehên siyasî bihatana bijihexistin.

Ji bona ku dam û destgehên serdarîyê tede bi rastî ve hebûn û jînê ji xwe re bidin biwergirtin û ew xwe ji dam û destgehên dewletê bidin bicudakirin, da ku hemû Libatên wê bi lihevhatî ve bidin bikêrkirin û li gora armancê de bikaribin bêtin bidîtin, ew bi ez bûneke

taybetîyî ve têtê biniyazmendîkirin, ew ji bona Libatên xwe bi hesteke tevayîyî xizmatîya bi hev re, bi hinereke xweyî taybetî ve ji bona parastina xwe û herwehajî bi vîneke wetov jî têtê biniyazmendîkirin. Ev hebûna bi taybetî ve daxwaza civînan, şewirdarîyan dide bikirin, da ku giftûgoyan bidin bikirin, biryaran bidin biwergirtin û herwehajî li ser mafe, li ser dadkirinê û diserhevgirtinan re bidin biaxivtin, yên ku ew bes ji bona Mîr ve têtin bihiştin û ew wetov Desteyê Bala deha bêtir bi avrû ve didin biderxistin, çiqasîjî ku ew pêtkirineke mezintir bi wê ve ji xwe re didin bikirin. Dijwarî di wir de têtê biderkevtin, ku ev pêkhatina jêrî tevayî di tevaya dewletê de divê bête birêkûpêkxistin, nabe, ku destûra giştî di rêya hîmkirina xweyî taybetî de bide biveguhertin. Divê hergav desthilatîya taybetîyî nîşankirî ji bona mana wîna ji desthilatîya dewletê, ya ku ew ji bona mana wê divê bide bikarkirin, bête bicudakirin. Bi kurtî ve, divê ku ew hergav li dar be, Serdarîyê ji bona Milet û ne Milet ji bona Serdarîyê bide bigorîkirin.

Tevîjî ku dam û destgehên çêkirîyî serdarîyê bi xwe jî ve karê dam û destgehekîyî çêkirîyî dîn têtê biderkevtin û ew ji bona xwe tanî radeyekî bes û bi tenha ve jîneke qerzdarkirinî û bi jêrkirî ve ji xwe re dide biwergirtin, weha ew dikare bi hinere kêmtir yajî bêtir ve û bi lez ve bide bireftarîkirin, ew xwe, mîna ku Merov dibêje, bi tendurustiyeyeke xurt yanî lawaz ve dide bidilxweşkirin. Di dawîya dawî de jî ew dikare, bêyî ku ew xwe ji armanca danîna xwe bide bidûrkirin, li gora şeweyê destûra xwe bêtir yajî kêmtir jê bide biwengerandin.

Ji van hemû cudabûnan bes û bi tenha ve pêwendîyên cudan têtin bipeydakirin, yên ku ew di navbera Serdarîyê û dam û destgehên dewletê de li gora lihevraştînan û pêwendîyên taybetî de divên bêtin bimayînkirin, yên ku di rêya wan de dewlet bi xwe ve jî dê bête biveguhertin. Jibervêjî ve dê pir caran baştirîn Serdarî jî bi kêmasî ve bête biderkevtin, heger ku pêwendîyên wê ne li gora kêmasîyên dam û destgehên siyasî de, yên ku ew bi wê ve têtin bivegirêdan, neyêtin biveguhertin.

## Derîyê Duwem

### Ji bîr û bawerîya ku ew rengên Serîdarîyî cudayî dide bipêkanîn.

Da ku ez bingehê giştîyî van cudanbûnan bi hev re bidim biberamberîkirin, divê ez li vêderê de di navbera bîr û bawerîyê û serdarîyê de bidim bicudakirin, mîna ku min berê di navbera dewletê û Serwer de dayite bicudakirin.

dam û destgehê -Körper- Balayî dikare ji jimareke mezin yanjî biçûk ji libatan bête bidurustkirin. Endazî di navbera Serwer û Jêrdaran de, mîna ku min dayite bigotin, weha mezin bû, çend Milet bi pîrbûn ve dihate biderkevtin. Li gora awireke pêxistîyî beramberkirî de Merov dikare vê bi vî rengî ve ji bona serdarîyê der barê Karmendan de bide bigotin.

Belê jiber ku tevaya hinera serdarîyê bi xwe jî ve hemîşe bi hinera dewletê ve tete biderkevtin, weha ew xwe tucarî nikare bide biveguhertin. Ji vê tete biencamkirin, ku ji bona wê, çend ku ew bêtir ji vê hinera hanê li ser libatên xwe de dide bikaranîn, deha kêmtir jêre tete bihiştin, da ku ew li ser tevaya Milet de bide bikêrkirin.

Çend serjimara Karmendan bêtir bêtin biderkevtin, deha lawaztir li gorê de serdarî tete biderkevtin. Jiber ku ev bi bîr û bawerîyeke bingehî ve tete biderkevtin, weha em dixwazin, ku em bi taybetî ve guh pê bidin bidan. Em dixwazin, wê weha bi diyar ve li gora karîne de bidin birewşenkirin.

Di Serpereştîya dewletê de em dikarin di nava Sê vînen bingehî cudan de jihev bidin biderxistin: Vîna pêşî, ya ku bi her Neferekî ve tete vegirêdan û ew bis û bi tenha ve xwe di berjewendîya wî de dide biderxistin. Vîna duwem, ya ku ew xwe bi tevayîkirina vîna Karmendan ve dide biderxistin, ya ku ew xwe bes û bi tenha ve ji bona ser berjewendîya Mîr dide birakişandin û ya ku Merov wê bi vîna Desteyan ve dikare bide binavkirin. Beramberî serdarîyê ev vîna hanê bi tevabûnê ve tete biderkevtin û ew beramberî bi dewletê ve, ya ku jê serdarî perçeyekî dide bipêkanîn, bi vîneke yekane ve tete biderkevtin.

Vîna sêyem ew bi vîna Milet ve yanjî bi ya Serwer ve têtê biderkevtin, ya ku ew beramberî dewletê nala giştî û herwehajî beramberî serdarîyê mîna perçeyekî ji giştî bi tevabûnê ve têtê biderkevtin.

Di baştirîn Qanûnguzarîyê de divê ji bona vîna yekanan yanjî Neferan hiç pêtbûnek neyête bidîtin, divê ew ji bona vîna dam û destgehên serdarîyê zor bi serûştîyeke jêrî ve bête bidîtin û vîna tevabûnê yanjî Serwer bi vî corî ve hemîşe divê bête bizalkirin û ew divê nala yek nişana xwe lêgirtinê ji bona hemûyên din bête bidîtin.

Li gora qanûneke serûştî de biservajîvênajî dê ev vînen cudan bi kêrvetir ve bêtin biderkevtin, çend ku ew xwe bi bêtir ve ligel hevdu de bidin biserhevkirin. Wisa hergav Vîna Tevabûnê -Allgemeinwille- bi lawaz ve têtê biderkevtin, Vîna dam û destgehên serdarîyê cihê duwem ji xwe re dide biwergirtin û Vîna Kesîyî Taybetî -Privatwille- ji xwe re cihê yekem dide biwergirtin, weha ku di nava serdarîyê de her Libatek di pêşî de bi xwedanê Kesîtîya xwe ve têtê derkevtin, di pişt re ew bi Kesê Balatîyê ve têtê derkevtin û di dawîya dawî de ew xwe nala Neşînvane dewletê dide bidiyarkirin, Yê ku ew xwe di cihêkî wetov de didin bidîtin, ku ew xweser tutiştî beramberî yasa û qanûnên dewletê nikarin bidin bikirin.

Di piştî vanê çûyî de heger ku Serdarî xwe di nava destên yek Neferî de bide bidîtin, wetov vîna kesîtîyî taybetî û vîna dam û destgehên serdarîyê bi carekê ve bi yek ve têtê biderkevtin û li ser vê de vîna sêyem bi berztirîn pileyê hinera xweyî hundur ve têtê bigihaştin. Wêçaxê bikaranîna hinerê bi pîvana vîne ve têtê vegirêdan û hinera pêwîstîyî serdarîyê bi neveguhertî ve têtê biderkevtin, wer ji vê têtê biencamkirin, ku di nava serdarîyan de, ya ku ew ji bal yekekî bi tenha ve têtê biserdarîkirin, bi kêrtirîn ve têtê biderkevtin.

Biservajîvêjî ve heger ku em serdarîyê ligel Desthilatîya Qanûnguzarîyê de bidin biyekkirin, em Serwer bi Mîr ve didin bikirin û hemû Neşînvanan wetovjî bi pir Kesên serdarîkirinê ve didin bikirin, weha dê vîna Deste -Standeswille-, jiber ku ew xwe di nava tevabûnê de dide bixistin, nema bêtir bi kêr ve bête biderkevtin, mîna ku berê jêre dihate bidîtin û ew dê ji bona vînen dinî taybetî hemû hinera xwe bide bihiştin. Weha dê serdarî xwe, tevî ku hinera wêyî bi serê xwe ve hemîşe wekxwe têtê bidîtin, di hinera xweyî kêmtirînî endazî yanjî kêrkirinê de bide bidîtin.

Ev pêwendîyên hanê bê gûman têtin biderkevtin û bitemaşekirinên din hêjbêtir ji bona derxistina rastîya wan têtin bidîtin. Merov ji bona nimûne ji xwe re dide bitemaşekirin, ku her Kesekî serdarkîrî di nava dam û destgehên xwe de -Körper- bi jêhatîtir ve ji her Neşîvanekî dewletê di nava yên xwe de tête bidîtin û ku bi vêjî ve vîna Yekane -Einzelwille- pir bi dûrtir ve kêrê li ser reftara serdarîyê de dide biderxist, ji kêra ku ji Serwer re li ser wê de tête bidîtin; jiber ku her Kesekî serdarîkirî bigir hergav karek ji karên serdarîyê pê hatîye bisipartin, di dema ku ji bona hîç Neşîvanekî dewletê bi tenha xwe ve kirina karekî ji karên Sewerîyî pê nehatîye bidan. Çend xwe li ser vê de dewlet bide bifirehkirin, deha bêtir hinera wêyî rastî tête bigewrekirin, gerjî ku ew jî ne li gora endazîya firehbûna wêna de tête biderkevtin. Belam heger dewlet mîna xwe hate bihiştin, wetov Serdarî ji xwe re dide sûdkirin, gerjî ku Karmend xwe pir jî bidin bêtirkirin, belê di vê de tu gewrebûna desthilatîyê nayête bidîtin; jiber ku ev hinera hanê bi dewletê ve tête bivegirêdan, ya ku jêre hemîşe pîvaneke mîna hev tête bidîtin. Bi vî rengê hanê ve endazîya xurtbûna yanjî kêrkirina serdarîyê xwe dide bikêmkirin, bêyî ku xurtbûna wêyî bi serê xwe -Absolut- yanjî rastî ve bikaribe bête bigewrekirin.

Hêjbêtir bi rastî ve tête biderkevtin, ku kar û bar bi hêdî ve têtin bikirin, herçend ku pêtir Xelk xwe pê bidin bimijûlkirin û Merov divê li nik pêsipartineke mezinî wisa de bi pêgirtina xwe ve li ser jîrbûna xwe de pir kêr piştê bi bext ve bide bigirêdan. Merov kêseke baş bi hêsanî ve dihêle ji nava destên xwe bête biberdan, wetov Merov di rêya remankirina bi dawî de pir caran mêweyê remana xwe ji nava destên xwe dide biwindakirin.

Wetov min xweset, ku ez bidim bidiyarkirin, ku dê Serdarî weha deha bête bisistûpistkirin, her ku çend Karmend bêtir bêtin bipirkin. Berfêvêjî min dabû bieşkerekirin, herçend ku Miletê mezin bête biderkevtin, divê weha deha desthilatîya bergîrîyê bête bigewrekirin. Jivê tête biderkevtin, ku endazîya Karmendan ligel serdarîyê de divê bi servajî endazîya Jêrdaran ve ligel Serwer de bête biderkevtin, ango, herçend ku deha dewlet xwe bide bimezinkirin, weha deha divê Serdarî xwe bide biçûktirkirin, Weha divê ligel bêtirbûna serjimara Milet de jimara Hefsardaran timî bête bikêmkirin.

## 87 Peymana Civakî

---

Belê li vêderê de ez bes li ser endazîya xurtbûna serdarîyê de û ne li ser rastîya endazîya wêna de didim biaxivitin; jiber ku bi servajîvêjî ve herçend ku Hefsardar bêtir bêtin biderkevtin, weha deha vîna wanî Desteyî -Standeswille- xwe ji bona vîna Tevabûnê -Allgemeinwillen- dide binêzîkîkrin, dema ku min di berê de dabû bigotin, ku li jêr yek Kesekî Balayî de ev vîna Desteyî bi xwe ve bes rûçikê vîna Yekanan -Einzelwillen- ji xwe re dide biwergirtin. Wisa Merov li alîyekî de dide biwindakirin, bê ka çî Merov bi rastî ve li alîyê din de ji xwe re dikarîbû bida qazanckirin. Di vir de hunera Qanûnguzar têtê bidîtin, ku ew bikaribe wê deqê bide binîşankirin, ya ku têtê hiner û vîna serdarîyê hergav endazîyê ligel hevdu de dide biparastin û ya ku ew têtê ji bona dewletê endazîya bi qazanctirîn ve dide bigirawkirin.

## Derîyê Sêyem

### Parvekirina Serdarîyan

Ji derîyê çûyî de tete bixuyanîkirin, çima Merov reng yanjî şêweyên cudan ji serdarîyan li gora jimara Libatan de, yên ku ew jê wan têtin bisazkirin, dide bicudakirin. Di vî derîyê hanê de em dixwazin bes lê bidin bivenerandin, çilo ev parvekirina hanê xwe dide bipeydakirin.

Serwer di pêşî de dikare serdarîyê ji bona tevaya Milet yanjî ji bona beşekî mezin ji Milet bide bisipartin, weha ku piranîya Karmendên serdarîyê bi Neşîvanên dewletê ve hatîye bisipartin, yên ku ew nala Neşîvanên dewletê sade têtin biderkevtin. Ev rengê serdarîya hanê Merov bi demokratîyê ve dide binavkirin.

Yanjî ew dikare serdarîyê di nava destên kêr de bide bidanîn, weha ku jimara Neşîvanên dewletê sade mezintir tete bidîtin, ji yên Kesên ku ew serdarîkirinê didin bikirin. Ev rengê serdarîyê hanê dê bi Aristokratîyê ve bête binavkirin.

Di dawî de ew dikare tevaya serdarîyê ji bona nava destên yekî bi tenê ve bide bisipartin, yê ku jê hemû Karmendên din deshilatîya xwe bidin biwergirtin. Ev rengê sêyem bi pirtirîn ve tete derkevtin û jêre Padişah yanjî Serdarîya Padişahî tete bivegotin.

Di vê de divê lê bête biguhpêdan, ku ev hemû rengên hanê yanjî bi kêmanî ve herduwên pêşî bêtir yanjî kêmtir bi karînapêkhatinê ve tete biderkevtin û herwehaji ji wan re tanî sînorekî dûr ji cihê livandî tete bihiştin; jiber ku demokrasî dikare tevaya Milet bi ber xwe ve bide bixistin yanjî ew xwe li ser nivîtîyê de bide bisînorkirin. Aristokratî dikare ji aliyê xwe de ji destpêkirina nivê Milet tanî kêmtirîn jimar ji mezinbûneke nenişankirî bide bisînorkirin. Herwehaji Padişahî dikare xwe bide biperçekirin. Li gora destûra xwe de Sparta hergav bi du Padişahan ve dihate bidîtin. Der Imperatorîya Roman de carcaranjî heşt Imperator di yek carê de dihatin bidîtin, bêyî ku Merov bikarîba bida bigotin, ku Imperatorî hatîye biperçekirin. Bi vî şêweyê hanê ve yek deq tete bidîtin, ku tede rengê serdarîyêkê ji



bona renekî dinî serdarîyê bête biveguhertin. Merov dide dîtin, ku bes li jêr hersêyên bi navkirî ve Serdarî bi rastî ve dikare weha pir rengên cudayî ji xwe re bide bipeydakirin, mîna ku dewlet bi xwedan Neşînvanan ve tete biderkevtin.

Hêjbêtir: Jiber ku her serdarîyek bi xweji ve dikare tanî radeyekî careke din di perçeyên din de xwe bide bijihexistin, ku ji wan perçeyek bi vî şeweyî ve, perçeyê din bi şeweyekî din ve bête biserpereşîkîrin, wetov ji girêdana van hersê rengan komeke ji rengên cudan dikare bête bipeydakirin, ku heryek ji wan bi hemû rengên sade ve bête bicarkirin.

Heger ku di nava dewletên cudan de jimara Bilindên Karmendên Serdarîyê bi endazîyeke servajî ve beramberî bi jimara Neşînvanan dewletê divê bête bipeydakirin, weha jê tete biencamkirin, ku bi giştî ve ji bona dewletên biçûk serdarîya demokratî, ji bona dewletên navînî sristokratî û ji bona dewletên mezin Padişahî bi baştirîn ve tete biderkevtin. Ev rêzana hanê bi encamkirina xweser ve ji bona danîna wê bîr û bawerîya hanê tete bidîtin; belam kî dikare ji bal xwe de koma rûdanan bide bijimartin, yên ku ew ji bal jirêderketîyan de bi neçarî ve dikarin bêtin bikirin?

## Derîyê Çarem

### Demokrasî

Kî qanûnê dide binivîsandin, ji her yekekî din baştir dide bizanîn, çilo ew divê bête bikirin û divê bête biliberkevtin. Wer li ser vê de tête bidiyarkirin, ku hîç destûrek baştir nikare bête bidan, ji ya ku têde Desthilatîya Bicîanînê ligel Qanûnguzaryê de tête bibestandin. Belê tanî radeyekî ev zîmeta hanê bi xwe jî ve nahêle, ku serdarîya demokrasî bi têrbûn ve bête bidîtin; jiber ku tiştên li nik wê de, yên ku ew divên ji hev bêtin bicudakirin, ew nayêtin bikirin û jiber ku Mîr û Serwer, yên ku bes û bi tenha ve bi yekekî ve û bi wî Kesî bi xwe ve divên bêtin biderkevtin, bi hev re yek serdarîyê bêyî serdarîyê didin bisazkirin.

Ev bi başî ve nayête bidîtin, yê ku ew qanûnê dide bidanîn, wê bide bicîanîn. Werjî bi başî ve nayête bidîtin, ku dam û destgehên Millet -Volkskörper- berê guhpêdana xwe ji armancên tevabûnê bidin biwergerandin, da ku ew berê wê ber bi danavên taybetî ve bidin vivekirin. Jê bi metirstirîn ve nayête biderkevtin, gava ku kêra berjewendîya taybetî Neferî di nava kar û barên Giştî -Öffentliche- de bête bipeydakirin. Werjî bikaranîna sexteyî qanûnan ji bal serdarîyê de bi karekî pîsî biçûk ve beramberî bi genîbûna Qanûnguzar ve tête biderkevtin, ya ku ew di encamê neçarî guhpêdana daxwaza Neferîyî taybetî de tête biderkevtin. Wer bi vî rengê hanê dewlet di cewhera xwe de hatîye bigenîkirin, her çakkirinek hîç nikare bête bikirin. Miletek, yê ku wî ligel desthilatîya serdarîyê de tucarî bi xerabî ve nedaye bibazîkirin, wehajî deha dê tucarî bi serxwebûna xwe ve nede biyarîkirin. Miletek, yê ku wî hergav bi başî ve dida biserdarîkirin, bi carekê ve niyazmendîya wî bi serdarîkirinê ve dê neyête bidîtin.

Heger ku Merov gotinê di tevaya tûjbûna têgihîştina wê de bide biwergirtin, weha hêjî tucarîjî demokrasîyek rast nehatîye bipeydakirin û ew dê tucarîjî neyête bipeydakirin. Ev bi dijî rêkûpêkbûna serûştîyê ve tête biderkevtin, ku jimara mezin dide biserdarîkirin û jimara biçûk dê bête biserdarîkirin. Bi serîyan ve

nikare bête bikevtin, ku Milet xwe li dûhevdu de di girbûnê de bide bidîtin, da ku ew xwe ligel kar û barên serdarîyê de bide bimijûlkin û jivêjî bi hêsanî ve tête biderkevtin, ku ew ji bona bicîanîna van karan nikare tu Encumenan bide bilidarxistin, heger ku ew rengê serpereştîyê nede biveguhertin.

Ez bi rastî ve didim bibawerkin, ku ez dê bikaribim wê bîr û bawerîyê bidim bigotin, ku kar û barên serdarîyê li ser Karmendên cudan de têtin biparvekin, yên ku ew bi kêmtirîn bi pîrbûn ve têtin biderkevtin û yên ku ew bi zû yanjî dereng ve dê mezintirîn desthilatî bi destên xwe ve bidin bixistin. Pîr bi hêsanî jî ve dê ji wan re bête biderkevtin, ku ew wan kar û baran bikaribin bidin bikin, yên ku ew wan bi rêyekê serûştî ve ber bi pê ve didin birakişandin.

Ev rengê serdarîyê çend bi dijwarî ve ji bona encamkirina karen girng bi carekê ve dide bimerckirin! Yekem ew dewleteke zor biçûk dide bimerckirin, ya ku tête Milet bi hêsanî ve dikare bête bixirkirin û ji bona her Neşîvanekî kêseke têrkirî tête biderkevtin, da ku ew dîgerên din ji xwe re bide binaskirin. Duwem ew hêsanîbûneke mezinî reweştan dide bimerckirin, yên ku ew tu mehanan ji bona kar û reftarên pîr giran nadin bidan. Sêyem ew Wekhevbûna bi carekê ve beramberî destebûnê û dewlemendîyê dide bimerckirin, ya ku jêre jî bêyî wekhevbûna mafeyan yanjîDeshilatîyê tu hebûneke dirêj nikarîbû bihata bidîtin. Di dawîya dawî de jî ew kêmtir yanjî bigir hêç jîyaneke giran -Luxus- nade bimerckirin; jiber ku jîyana giran di encamê dewlemendbûnê de tête biderkevtin, yanjî ew wê dide bineçarîkin. Ew nebes tenê Delemendan, lêbelêjî Perîşanan jî dide bigenîkin. Ew Dewlemendan di rêya maldarîyê de û perîşanan di rêya dilbijandinê de dide bigenîkin. Ew welatê Bav û Kalan bi cihîhekî Tirsonekan û Qeşmeran ve dide biveguhertin. Ew ji dewletê tevaya Neşîvanan dide bikişandin, da ku ew yekekî ji bona yê din bi Bende ve bide bikin û ew tevan bi Bendeyên bawerîyan ve bide bikin.

Li ser vî bingehê hanê de Nivîsvanekî bi nav û bangê Firensî ve ji bona bîr û bawerîya komarê dayite bigotin, ku bêyî qencîtîyê hemû mercên dayînî nikarin xwe bidin bigirtin; belam jiber ku wî di navbera pêwistîyên cudabnûnên de nedida bikin, wetov vî hozanê mezin pîr caran durustî û tanî radeyekîjî diyarbûn jêre nedihatî bipeydaikin û wî nedida bidîtin, ku ew deshilatîya serwerî li herderê

de bimînahev ve têtê biderkevtin û di encamê vê de di hemû dewletên baş bi rêkûpêkxistî ve bîr û bawerî -Prinzip- pir yanjî kêr li gora rengê serdarîyê de bi mînahev ve têtê biderkevtin.

Di dawî de jî ez dixwazim bidim birûnkirin, ku hîç serdarîyek bi pileyekî wisa bilnd ve bi ber cengên navxweyî û hejandinên navxweyî ve mîna serdarîya demokrasî yanjî serdarîya gelêrî nayête bikevtin; jiber ku hîç serdarîyeke din weha bi tûjbûn û weha li dûhevdû de ji bona veguhertina reng -Form- dide bixebatkirin û tu jî mîna wêna şiyarbûn û mêrxasîyê ji bona parastina hiştina rengê xwe nade bixwestin. Di destura wê de divê durust bête binivîsandin, ku her Neşînvaneke xwe bi hinerê û demanê ve bide biçekkirin û her roj di jîna xwe de ji nava cerg û hinavên xwe li xwe bidebi vegerandin, mîna ku gernasekî Wiowode -Viyovode<sup>1</sup>- di parlemana Polonî de dayite bigotin: "Malo periculosam libertatem quam quietum servitium". - Ez azadîyeke pir bi tirs ve di ser bendekîyeke aram de didim biwergirtin-.

Heger Miletek ji Xwedanan bihata bipêkhatin, wan dê xwe bi demokrasî ve bidana biserdarîkirin. Serdarîyeke weha deha bi carekê ve baştirîn ji bona Merovan nayête biligorêkirin.

---

<sup>1</sup>Wiowode -viyovodê- Posnan, ew bi Bavê Padişahê Polonya û Doqê Lothringen - Lotringin- ve têtê biderkevtin.

## Derîyê Pêncem

### Aristokratî -Xanedanî-

Em li vêderê de ligel du Kesên Sincîtyî bi xurtî ve ji hevdû cudakirî de xwe didin bimijulkirin. Evjî bi rastî ve ligel serdarîyê -Regierung- û Serwer -Souverän- de tête biderkevtin. Bi vî corî ve em xwe ligel du vînên tevayîbûnê de didin bimijulkirin, yek ji wan xwe li ser tevaya Neşînvanan de dide bivegirtin û ya din bes û bi tena ve xwe beramberî Libatên serdarîyê ve dide biderxistin. Tevîjî ku pêre Serdarî destûra dewletîyî navxweyî bi dilê xwe ve dikare bide birêkûpêkkirin, belam ew divê beramberî bi Milet ve bes û bi tenha ve bi navê Serwer ve bide biaxivtin, ango ku ew bi navê Milet ve bi xwe ve bide biaxivtin, vê divê Merov tucarî nede bijibîrakirin.

der qonaxên civakîyî pêşî de bi xanedanî ve dihate biserdarîkirin. Sermiyanên Xanedanan di navhevdû de li ser kar û barên tevayîbûnê de didane biamojgarîkirin. Ciwanan bêyî hîc pistekê jî serên xwe ji bona serpêhatîyên salxurdan didan bitewandin. Jibervêjî ve navên Keşan, Pîran, Pîremerdan û Piyadgaran têtin bidîtin. Hovên Emerîkîyî Jorî hêjî îro jî bi vî rengê hanê ve têtin biserdarîkirin.

Lêbelê çend bêtir newekhevbûna destûrmendîyê newekhevbûna serûştîyê jihev bide bixistin, weha deha dê dewlemendî yanjî desthilatî<sup>1</sup> cihê pîrbûnê ji xwe re bide bigirtin û wetov Xanedanîyêke helbijartî hate bipeydakirin. Gava ku di dawîya dawî de jî ligel maldarîyê de desthilatî jî ji bona nava destên Nevîyan hate bikevtin û weha zemîn ji bona Xanedanên Desthilat -Patrizierfamilien- hate bidurustkirin û Merov dikarîbû ji xwe re Pî-remerdên bîstsalî bide bidîtin.

Bi vî corî ve Sê Rengên Xanedanîyê têtin dîtin: Rengê Serûştîyê, Rengê Helbijartîyê û Rengê Şûndarîyê. Rengê pêşî bes û bi

---

<sup>1</sup>Gotina "optimates" li nik Pîran de di diyarîya xwe de ne bi baştirvanan ve tête biderkevtin; belam ew bi Desthilatirvanan ve tête biderkevtin.

tenha ve ji bona Miletên sade tête bilihevkin. Rengê sêyem ji bedtirîn rengê serdarîyan tête biderkevtin. Rengê duwem ji baştirîn rengan tête biderkevtin û ew rast û durust bi Xanedanî ve tête biderkevtin.

Di vî rengê hanê de jibil, ku herdu desthilatî jihev têtin biparvekin, hêjîbêtir têde tête bidîtin, ku Libatên wê têtin bihelbijartin, di gava ku li nik Serdarîya Gelêrî de hemû Neşînvânên dewletî di zayîna xwe de bi Kesên serdarîkirî ve têtin biderkevtin, belam li nik Xanedanîyê de ew Kes bi jimareke kêr ve têtin bisînorkirin, yên ku ew divên di rêya helbijartinê de bêtin biderkevtin<sup>1</sup>. Ev rêya hanê bi serê xwe ve tête biderkevtin, kû têde mafedarî, dûrbînî, serpêhatî û hemûyê din têtin bidîtin, yên ku ew ji bona berjewendî û rêzlegirtina tevayîbûnê têtin bipêwistîkin, hêjîbêtir pir Neşînvânên wetov ji bona Serdarîyeke hozan têtin biniyazmendîkin.

Belê hêjîbêtir girbûn bi hêsanî ve dikarin bêtin bigirtin; li ser kar û baran de bi sivikî ve bête biaxivtin û bi rêkûpêkîyeke mezin û rast û durust ew bêtin birêvebirin; hêjîbêtir di rêya Pîremerdên hêjakirî de dîtina dewletê dê ew beramberî dewletên derve baştir bide biderxistin, ji ya ku ew ji bal Nenasan ve yanjî ji bal Komkeke çepelî ve bête biderkevtin.

Bi gotinekê ve ew bi baştirîn û serûştirîn Rêstik -Ordnung- ve tête biderkevtin, ya ku têde deha baştirîn Hozan Cemaweran didin biserdarîkin; wetov Merov dide bibawerîkin, ku serdarîya wan di kar û barên xwe ji bona xweşîya tevayîbûnê û ne ji bona berjewendîya xwe dide biermanckirin. Merov divê Destikan -Mittel- ne bêyî niyazmendîyê bide bipirkin yanjî wan di rêya Bîsthezar Merov de bide bicîanîn, yên ku ew ji bal sed Merovên helbijartî de deha baştir dikarin bidin biencamkin. Lêbelê li vêderê de divê di serguhnan re

<sup>1</sup>Bi giringbûneke mezin ve danîna qanûnîyî rengê helbijartinê tête biderkevtin, jiber ku gava Merov wê ji bona vîna Mîr bide bihiştin, wetov bi neçarî ve Merov xwe berdestî Xanedanîya Şûngirîyê dide bikirin, mîna ku evya bi serê Komarên Vênêtsiya û Bern ve hate bikirin. Ya pêşî ji demeke dirêj ve bi dewleteke jihevkevtî ve tête bidîtin û ya dawî hêjî xwe bes û bi tenha ve di rêya hozanbûna bilindî Pîremerdên xwe de dide bigirtin; ev jî him bi hêjabûnekê ve û himjî bi jirêderkevîbûneke bi tirs ve tête biderkevtin.

neyête biavêtin, ku berjewendîya taybetîyî Libatên serdarîyê dide bidestpêkirin, ku ew desthilatîya dewletê kêmtir li gora qanûnên vîna tevayîbûnê de bidin birêvebirin û ku mildarîyeke bi neçarî ve ji wan re tête bipeydakirin, ku ew ji qanûnan perçeyekî ji desthilatîya bicîanîna wan ji xwe re bide biwergirtin.

Derbarê pêwendîyên taybetîyî serdarîya xanedanîyê tête biderkevtin, ku dewlet têde ne weha biçûk û Milet jî ne weha sade û mafedar divên bêtin biderkevtin, divê ku têde bicîanîna qanûnan xweser li dû vîna tevayîbûnê de bête biçûyîn, mîna ku evaya li nik serdarîyeke demokratîyî baş de tête birûdan. Tevlivêjî de divê têde Miletê ne wehajî bi mezin ve bête biderkevtin, ku hin ji Serokan, da ku ew Milet bidin biserdarîkirin, di nava perçên welatên xwe de xwe nala Serwer didin biderxistin û dibe, ku ew bikarbin xwe bidin biazadkirin û dawîya dawî de jî ala serxwebûna xwe serbilind bikin.

Heger ku têde jî xanedanî hinek qencîyan kêmtir ji serdarîya gelêrî dide biderxistin, wehajî pêrejî ew ji bona hin başîyên taybetîyên din mîna nermîbûnê li nik Dewlemendan de û pêdilxweşbûnê li nik Perîşanan de dide bidaxwazkirin; jiber ku wekhevbûneke bi rast û durustî ve têde nikare bête bipeydakirin. Wehajî bi xwe jî ve li Sparta de ew wekhevbûna hanê nikarîbû bihata bipolarastin. Hegerjî ev rengê serdarîya hanê jî tanî radeyekî newekhevbûna maldarîyê bide bihiştin, weha hoyê vênajî bes û bi tenha ve di wir de tête bidîtin, ku di rêzanîyê de serpereşîya kar û barên dewletê ji bona wan Merovan tête bispartin, yên ku ew bi siviktirîn ve ji bona wê tevaya dema xwe didin bitirxankirin, lêbelê ne ku mîna Aristo dide bigotin, da ku hemîşe ji bona berjewendîya Dewlemendan bête biderkevtin. Biservajîvêjî ve pir bi giringî ve tête biderkevtin, ku ji bona Milet tanî radeyekî helbijartineke dijî vê divê bête bieşkerekirin, ku di berjewendîya Merovan de hoyên giringtir ji dilbijandina dewlemendbûnê têtin bidîtin.

## Derîyê Şeşem

### Padîşahî

Tanî niha me li Mîr de nala Kesekî Sincî û bi Hevreyî -Kollektiv- ve date bitemaşekirin, yê ku ew di rêya hinera qanûnan de hatîye biyekkirin û bi Hilgirvanê bi cîanîna desthilatîyê ve tete biderkevtin. Niha em vê deshilatîya hanê di nava destên yek Jîndarî, yek Merovê rastî de bihiştî ve lê didin bitemaşekirin, yê ku ew bi tenha xwe ve bi mafedar ve tete bidîtin, ku ew li gora qanûnan de mafe bi destên xwe ve dide bixistin. Merovekî wisa dê bi Padîşah yanjî Keye ve bête binavkirin.

Bi carekê ve bi servajî rengên serdarîyên dinjî ve, ku li nik wan de yek bi hevrebûneke ji Kesan ve yek Kesekî bi tenha ve dide biderxistin, li vêderê de yek Kesek bi tenha ve yek bi hevrebûneke bi tenha ve dide biwênerîkirin, weha ku yekîtîya Kesîtiya Sincî, ya ku ew Mîr dide bidurustkirin, pêrejî bi yekîtîyeke laşî - Physisch- ve tete biderkevtin, ku tede hemû karînen, yên ku qanûn wan bi dijwarîyeke wetov mezin ve di yên din de dide biyekkirin, di serûştîyê de xwe didin bidîtin.

Weha vîna Milet mîna vîna Mîr, deshilatîya tevayîbûna dewletê nala desthilatîya tabetîyî serdarîyê tete biderkevtin. Bi kurtî ve hemû mîna hev û bi yek kişandinê ve têtin birakişandin. Hemû destik di yek destî de têtin bidîtin. Hemû xwe ber bi yek armancê ve didin bigavkirin. Hîc berberî nayêtin bidîtin, ku ew xwe bi xwe ve bidin binabûdkirin. Merov nikare hîc rengê ji destûrê ji xwe re bide biremankirin, ku tede kirina hinereke biçûk kêreke wetov mezin bikaribe bide biencamkirin. Mîna ku Archimides -Arxemides-, yê ku ew li ser xwe de li ser kenarê derya de tete birûniştin û ew keştîyeke mezin ji dûr ve bi rê ve dide bixistin, ez jî weha mîna wî ji xwe re li wêneyê Padîşahekî jîr didim bimeyzekekirin, yê ku ew avanîya dewleta xweyî fireh ji oda xweyî kar dide biserdarîkirin û ew her livandinekê dide bipeyda kirin, tevî ku ew jî di cihê xwe de bi diyar ve bê livandî tete biderkevtin. Hegerjî ku hîc serdarîyek mîna vîna nêyete bidîtin, ya ku hinereke wetov mezin di nava destên wê de tete bigirkin,



wehajî hîç serdarîyek mîna vêna nayête bipeydakirin, ku tède vîna yekane deha bêtir bi desthilat ve tète biderkevtin û ew vînen din bi hêsanî ve dikare bide bizalkirin. Hemû xwe ber bi yek armacê ve didin birakişandin, ev bi rast ve tète biderkevtin; belam bi tenê ve ev armanca hanê ne bi berjewendîya tevayîbûnê ve tète biderkevtin, hêjbêtir xurtbûna serdarîyê hemîşe bi ziyana dewletê ve tète biderkevtin.

Padîşah bêsînoriyê didin bidaxwazkirin û Merov ji dûr ve ji bona wan dide bibangkirin, ku baştirîn destik ji bona vêna tète bidîtin, ku ew evîndarîya Miletên ji xwe re bi dest ve bidin bixistin. Ev hevika hanê zor sipehî tète biderkevtin û tanî radeyekî jî pir rast tète bidîtin, pir bi bedbextî ve dê Merov xwe di Şahneşîniyê de li ser vê rastîyê de hergav bide biqerfêkirin. Desthilatîya ku ew ji evîndarîya Miletan tète biherikandin, bêgûman ew bi mezintirîn ve tète biderkevtin; belam ew ne bi girawkirî ve û bi merc ve tète biderkevtin; tucarîjî dê Mîr xwe ligl wê de nedin bitêrkirin. Baştirîn Mîr dilbijandina karînen bedbûnê ji xwe re didin bixwestin, gava ku ew ji bona wan bête bidaxwazkirin, bêyî ku jiber wê desthilatîya wan bikaribe bête bitalankirin. Bi bê sûd ve dê Peyvdarekî siyasî ligel wan de bide biaxivtin, ku belê hinera Miletê wan hinera wan dide bidurustkirin û ew bi xwe jî ve ji bona mezintirîn berjewendîya wan tète biderkevtin; heger ku Milet bête bigeşkirin, bipirkirin û biberkirin, ew zor bi başî ve didin bizanîn, ku ev ne bi rastî ve tète biderkevtin, jiber ku berjewendîya wanî xweyîtî dide bidaxwazîkirin, ku Milet lawaz, reben û perîşan bête biderkevtin û ku ew beramberî wan tucarîjî nikaribe serê xwe bide bihildan. Emê carekê ji caran bidin bidanîn, ku sertewandina hemîşeyî bi carekêyî Jêrdaran ve dê bête bipeydakirin, ez ji dil dixwazim pê bêtin birûniştin, ku dê ev ji bona Mîr bi sûd ve bête biderkevtin. Belam gava ku Milet bi xurt ve bête biderkevtin, dê vê xurtbûna hanê, ya ku ew dê bi ya wî ve bihata biderkevtin, ew li nik Hemsayê wîna de bi saw ve bida biderxistin. Lêbelê ev sûdkarîya hanê bi xwe ve bi bêsûd û bi bêrêkûpêkî ve tète biderkevtin û herdu jirêdekevtî nikarin ligel hevdu de bêtin bikirin. Weha bi serûştî de tète biderkevtin, ku Mîr hergav xwe bi wê rêzanê ve didin bigirtin, ya ku ew li nik wê de di pêşî de ji xwe re bikaribin sûdbexşîyê bidin biwergirtin. Evaya bi xwebû, ya ku Şamuêlê Padîşahê Israîlî ji bona Miletê Cihû pir bi giringî ve dixweet

bide binîşandan û Mikavilî jî bi mezintirîn eşkerebûn ve date bixuyanîkirin. Mikavilî wetov date bikirin, teyê bigota, ku ew dixwaze Padîşahan bide bifêrkirin, belam wî ji bona Miletan giringtirîn fêrbûn date bidan. Mikaviliya "Mîr" bi nivîsta Komarvanan ve tête biderkevtin<sup>1</sup>.

Ji Endazîyên giştî ve em hatin biliberkevtin, ku Padîşahî bes û bi tenha ve ji bona dewletên mezin bi başî ve tête biderkevtin û li nik azmonkirina wêna de dê bêtir rastîya vê hevokê ji me re bête bidiyarkirin. Çend bi pîrbûn ve jimara Karmendan bête biderkevtin, weha deha dûrbûn xwe di navbera Mîr û Jêrdarên wî de dide bikêmkirin û endazîya wekhevbûnê xwe di nava wan de dide binêzîkirin, weha ku di demokrasîyê de ev endazîya hanê bi yekê ve tête biderkevtin yanjî ku ew bi wekhevbûnê bi xwe tête biderkevtin. Ev dûrbûna hanê biservajîvêjî ve xwe bi wê pîvanê ve dide bimezintirkirin, mîna ku Karmendên serdarîyê xwe didin bikêmkirin û ew bi berzbûna xwe ve tête bigihaştin, gava ku serdarî di nava destên yekekî de bi tenha xwe ve bête bidîtin. Wêçaxê dûrbûn di navbera Mîr û Milet de pir mezin ve tête biderkevtin û ji bona dewletê piştgirtineke xurt nayête bidîtin. Da ku ev piştgirtina hanê ji bona wê bête biafirandin, divên Libatên Navînî ji Şahzadeyan, Merovên Gewre û Maqûlan bêtin bipeydakirin. Ev tev de jî ji bona dewleteke biçûk nayête bilihevkin, jiber ku pêkhatîyên desteyên civakîyî wisa dê wê ber bi nemanê ve bidin birêkin.

Xwe bi xwe ve bi dijwarî ve tête derdevtin, dewleteke mezin bi başî ve bête serdarîkirin, weha hêjîbêtir bi dijwarî ve ji Merovekî bi

---

<sup>1</sup>Mikavili Merovekî rastgo û Neşîvanekî başbû; lêbelê jiber ku ew ligel Xanedana Medici -Midişî- de bi bestekî ve dihate biderkevtin, wî xwe bi neçarî ve date bidîtin, ku ew li nik zordarîkirina welatê xwe de evindarîya azadîya wîna bide biveşartin. Belam li nik helbijartina Pehlewanên xweyî şemitandî de dihêle, ku Merov bi eşkere ve nêta wîyî veşartî bide binaskirin. Herwehajî dijîbûna di navbera nivîsta wîyî Mîr de li ser rêzanên peyivandî de û li ser rêzanên nivîsandina wî de li ser Titus Livius de, herwehajî li ser rêzanên nivîsandî de di Mêjûwa Filorens de hemû didin bieşkerekirin, ku nivîstên vî siyasîmedarî kur tanî niha bes û bi tenha ve ji bal Xwendevanên xav yanjî genî dihatin bixwendin. Şahneşîniya Roma ew nivîsta wîyî Mîr bi xurtî ve date biqedexekirin. Ez ji dil û can didim bibawerkirin, ku wî Şahneşîniya Roma bi taybetî ve date birûtûqtkirin.

tenê re tête derkevtin, ku ew wê bi başî ve bide biserdarîkirin. Her Kesek dizane, bê çi dê bête birûdan, heger ku Padîşah kar û barên serdarîyê xwe bi Dîgeran ve bide bisipartin.

Yekek ji cewhertirîn û neçartirîn kêmasî, ya ku ew hemîş başîya rengê serdarîya komarî beramber serdarîya padîşahî dide bigirawkirin, di vir de tête bidîtin, ku di nava serdarîya komarî de bîr û bawerîya giştî bigir hergav bes û bi tenha ve bi Merovên şiyar û Karînvanan ve bilindtirîn cih didin bisipartin, yê ku ew karmendîya xwe bi rûsipî ve didin birêvebirin, di dema ku di Padîşahîyê de, yê ku ew bi bilindtirîn cih ve têtin bigihaştin, bi pirî ve bes û bi tenha ve bi kê m mejî ve, bi canbazê biçûk ve û bi lewçe û gelacên biçûk ve têtin biderkevtin, yê ku ew jîrbûna xweyî biçûk bes û bi tenha ve di wir de didin bikaranîn, da ku ew ji wan re di nava Şahneşînîyê de rê ji bona bilindtirîn karmendîyê bide bitextkirin. Xweser piştî ku ew bi wan cihên bilind ve têtin bigihaştin, ji bona Milet bêtuwanîya xwe didin bieskerekin. Milet di helbijartina xwe de pir kêmtir ji Şahzadeyan dide bihelekin û Merovekî bi rastî ve lêhatî nala Serekwezîrekî di Serdarîya Padîşahîyê de wetov bi kê mî ve tête bipeydakirin, nala ku Merovekî bêvac xwe di nava nivê serê Serdarîyeke Komarî de dide bidîtin. Belam heger ku di encamê lihevraştatineke bextiyar de Merovekî wisa Hozanî zayînî ji bona serdarîyê Serdarîya Padîşahîyê bi destên xwe ve bide bixistin û ew windabûna wêna ji wan komên Nêçîrvanên bextiyarîyên qelp û nezan bide birizgarîkirin, weha dê Merov xwe li ser destikên wî de ser sûrayî bide bidîtin, yê ku ew wan ji xwe re dide bipeydakirin, herwehajî dê serdarîya wêna di nava welêt de hejandineke xurt bide bixuyanîkirin.

Da ku dewleteke Padîşahî bi başî ve bikaribe bête biserdarîkirin, dê bête bipêwistîkirin, ku mezinbûn û firehbûna wêna rast û durust li gora karînen Serdarîkirvan de divên bêtin derkevtin. Bi rastî ve gîrîkirin bi gelekî ve hêsantir ji serdarîkirinê tête biderkevtin. Heger ku ji Merov re destikekî bikêrhatî ve hate bipeydakirin, weha Merov dikare bi pencekê ve dunyayê bide biwêrankirin, belam da ku Merov wê bide bihilgirtin, ji Merov re şanên Herkules -Hêrkulês- têtin bidivakirin. Ger ku dewlet bes bi mezin ve bête biderkevtin, wetov hergav Şahzade bi biçûk ve tête biderkevtin. Gerjî zînet bi servajîvêjî ve bête biderkevtin, ku bi rastî jî ve ev pir bi kê m ve tête bidîtin, ku

dewlet ji bona Serekê xwe pir bi çûk ve tête biderkevtin, werjî dê ew pir bi xerabî ve bête biserdarîkirin; jiber ku Şahzade tim di nava serê xwe de bernamêyên pir mezin dide bihilgirtin, yê ku ew di nava wan de berjewendîya Milet dide bijibîrakirin û ew wî di rêya bikaranîna xerabîya jîrbûnên xweyî wetov mezin de nekêmtir ji Serokê kêm mejî di rêya karînen xweyî kêm de bi bedbext ve dide biderxistin. Her dewleteke padîşahî divê xwe rast û durust ligel her serdarîyeke nuh de li gora jîrbûna Şahzade bide bimezinkirin yanjî bibiçûkkirin, da ku jîrbûnên dam û destgehên Serdarîya bihevresuwarkirî pîveneke nîşankirî ji xwe re bide biwergirtin, ji bona ku dewlet bikaribe sînoren xweyî danînî bide biparastin, bêyî ku jiberwê ew bi nebaştir ve bête biserdarîkirin.

Diyartirîn bedbûn li nik serdarîyeke yek Neferî de tête biderkevtin, ku Cîneşînîya li dûhevdû de nikare bête bigirawkirin, ya ku ew li nik herdu rengên serdarîyî din de bi dûhevdû ve pêwendîyê dide bisazkirin. Li pişt mirina Padîşahekî de divê Merov yekekî din ji xwe re bide bipeydakirin; tanî helbijartinê nav demeke bi tirs ve tête bibuhurandin û helbijartin bi gurm û germîn ve têtin biderkevtin. Heger Neşînvânê dewletê xweddarîyeke sûdbexşîyeke kêm û jîrbûneke peyvdarîyê ji xwe re bi dest ve nedin bixisin, yê ku ew ligel vî rengê serdarîyê de bi hêsanî ve nikarin bêtin bilihevkin, wiha dê helbijartin di rêya ragiyandineke nexweş û bertûlkinê de bête bikêrkirin. Pir bi dût ve dê bête biderkevtin, Kesê ku ew ji xwe re dewletê dide bikirîn, ku ew wê ji bona yekekî din nede bifiroştin û dê ew nikaribe bi bêzîyan ve pişt xwe bi dilbijanên peran ve bide bivegirêdan; jiber ku di rêya peran de xurt pê têtin bigivaştin. Dereng yanjî zû di nava serdarîyeke wisa de dê hemû bi firontin ve bête biderkevtin. Dê aramî, ya ku Merov ji xwe re di jêrdarîya Padîşah de dida bibêhnikirin, bi gelegî ve bedtir ji nav dema gurm û germîna helbijartina Padîşah bête biderkevtin.

Belê Merov çî date bikirin, da ku ev bedkarîyên hanê neyêtin bikirin? Merov Tac û Text ji bona hin Binemalan bi Paşmanî ve date bikirin û rêstikek ji bona Cîneşînîyê date bidurustkirin, ya ku têde rê li ber her pevçûnekê de li nik mirina Padîşah de hate bigirtin. Ev dide biderxistin, ku Merov pîsîtiya Cîneşînîyê li şûna gelacîyên helbijartinê de date bidanîn, ku Merov têde aramîyeke bi xuyanî ve di

ser serdarîyeke hozanî de date bigirtin û herwehajî pêrejî Merov rê jêre date bivekirin, da ku Zarok, Merovên genî û tirsonek ji bona serdarîkirinê bêtin bigihaştin, ne ku pevçûn li ser helbijartina Padîşahêkî baş de divabû bihata bivêxistin. Merov neda biremankirin, ku divê Merov bigir hergav bide biwindakirin, heger ku Merov bi vî corê hanê ve xwe beramberî van rûdanên veguhertî bide bikirin. Gencê Dionys -Diyonis- bi carekê ve rastî date bigotin, gava ku wî ji bavê xwe re, yê ku wî ew bi reftareke şermezarî ve date bisûckirin û jêre pêrejî date bigotin: "Ma min tu bi nimûneyeke wisa ve dayite biperwerdekirin?" date bersifdan: "Ox, Bavê te jî ne Padîşah bû."

Hemû bi hev re didin bipalpêdan, ji yê ku ew serdarkirinê li ser Merovên dinî perwerdekirî de her hesteke dadwerîyê û hiştîyê jê didin bitalankirin. Merov divê xwe pir bide biwestandin, da ku Merov Şahzadeyên Genc ligel hunera serdarîkirinê de bide bihînkirin; belam ev perwerdekirina hanê ji bona wan anîna tu sûdbexşîyên mezin nade bidiyarkirin. Merov dê bi baştir ve bida bikirin, ger ku Merov pê bida bidestpêkirin, wan di hunera sertewandinê bida bifêrkirin. Bizurgtirîn Padîşah, yê ku wan der mêjûwê de navûbang ji xwe re dane biwergirtin, ji bona serdarîkirinê nehatine biperwerdekirin; jiber ku serdarîkirin bi zanistîyekê ve tete biderkevtin, ya ku Merov ji bona xwe weha kêr jê dide biwergirtin, çend bi dirêjî ve Merov wê dide bixwendin û ya ku Merov wê ji xwe re bi başî ve di rêya sertewandinê de jî di rêya fermandarîyê de dide biwergirtin.

Yekek ji kêmasîyên Serdarîya Padîşahî dudiliya wê di kar de tete biderkevtin. Jiber ku ew li gora rûçik û bayê ber serê Şahzadeyê serdarkirî yanî Kesên ji dêlva serdarîkirina wî de geh li dû vî neqşî de û gehî li dû neqşekî din de dirin. Ew bi bê tuwanî ve têtin biderkevtin, ku ew ji bona demeke dirêj armanceke nîşankirî bidin birêvebirin û ew helwesteke pêgîrî ji xwe re bidin bigirtin. Ev qulobazîya hergavî li nik rengên serdarîyên din de nayête bidîtin, yê ku di nava wan de Şahzade hergav bi xwe ve tete bihiştin. Ev qulobazîya hergavîyî hanê dewletê li dû hevdû de di nava hêlana çengbûnê de ji vê bîr û bawerîyê ji bona bîr û bawerîyeke din û ji vî neqşî ji bona neqşekî din dide bixistin. Jibervêjî ve Merov dide bidîtin, ku bi giştî ve li nik Şahneşînîyê de bêtir canbazî û li nik Senat -Civata Pîremerdan- de bêtir hozantî dide biserdarîkirin û ku Komar di rêya li dûçûna neqşên

hîmkirî û baştirî de bi armancên xwe ve têtê bigihaştin, di dema ku her veguhertinek di Encumena Wezîran de bête bikin, wehajî veguhertinek di dewletê de têtê bipeydakirin, jiber ku hemû Wezîr û bigir hemû Padîşah jî di wê bîr û bawerîyê de têtin biderkevtin, ku ew di her kar û barekî de bi servajî Pêşîyên xwe ve bidin bikin.

